

# WEELAT

Stratejiya hilbijartinê li gorî HADEP'ê tê danîn:

## Li dijî HADEP'ê



■ Piştî ku hilbijartin hate rojevê, ji her tiştî bêhtir rewşa HADEP'ê bû sermijara rojeva kurd û tirkan.


Dewleta Tirkîyeyê stratejiya xwe li gorî hêz û karîna HADEP'ê datîne. Lewre jî ji niha ve hemû saziyên rejîmê li dijî HADEP'ê ketine nava hevkarîyê. Kes û par-

tiyên ku bi yekcarî li hev nakin, li dijî HADEP'ê dibin wekî nal û bizmar. Partiyên ku nikarin ji barajê derbas bibin, bi tenê ji ber HADEP'ê naxwazin ev baraj bê rakirin. Ev tirsê serdestên tirk bi anketa artêşê jî derkete holê. Li aliyê din endam û piştgirên HADEP'ê jî li dijî vê yekê

polîtîkayê dimeşînin û ji gel piştgiriyeke mezin werdigirin. Bi taybetî kesên ku li Kurdistanê ji bo berendamtiyê serî li HADEP'ê dane li hin deveran ji hezarî jî diborin.

Li Kurdistanê ji zarokan bigirin heya kal û pîran her kes li ser hilbijartinê diaxive. (Nûçe:R.3)

## Azadiya WELAT



SAMÎ TAN

Li vê derê gotineke mamoste İsmail Beşikçi tê bîra mirov: "Ji ber ku ez wekî dadger nafikirim, ew ceza dide min." Bi rasfî jî biryara li ser Azadiya Welat gotina Beşikçi diçespîne.

Ji dozên ku li Azadiya Welat hatibûn vekirin, yek bi encam bû. Dadgerên DGM'ê cezayê hepsê û pereyan li xwedî û berpîrsê karê nivîsaran ê rojnameyê birî. Her wiha deh rojan jî biryara girtina rojnameyê da.

Xwediyê Rojnameyê M. Nuri Karakoyun bersiva dadger bi kurdî da, lewre jî dadger gelekî tengjî, heke di zagonê de bo girtina wî xalek hebûya, dê ew bida girtin. Tevî ku parêzgera rojnameyê sedema axaftina bi kurdî bi awayekî zelal diyar kir jî, hê ew lê dixebitî ku M. Nuri Karakoyun bi tirkî bide peyivandin û bi vê mebestê wî digot: "Tu karsaz î, heke tu bi tirkî nepeyvî, tu nikarî karê bazirganiyê bimeşîn."

Divê bê zanîn ku tiştê ku tê de hêmanên sûc hatine dîtîn wêneyek e. Wêneyên bi vî rengî di gelek rojnameyên din jî hatine weşandin. Lê ji bo ku çapemeniya tirk wêneyên bi vî rengî digel nivîsên bi çêr û dijûnan hatine dagirtin diweşînin, tu doz li wan

## Pêşketin û sizandin

nayê vekirin.

Di rojnameya me de li gorî sinca rojnamegeriyê em cih nadin çêran û wêneyên ku heqaretê li xelkê din. Lewre jî rojname ji dîtînen li ser pankarteke di meşekê de berpîrsê tê girtin û tê sizandin. Li vê derê gotineke mamoste İsmail Beşikçi tê bîra mirov: "Ji ber ku ez wekî dadger nafikirim, ew ceza dide min." Bi rastî jî ev biryar vê gotina Beşikçi diçespîne.

Di nava sê salan de ev, yekemîn doz e ku bi encam dibe. Di rê de çar dozên din hene û dê hinekên din jî li pey wan bînin. Yekemîn, doza li hejmara 107'an hatiye vekirin. Mijara dozê nûçeyek e, ew doz hê jî didome. Dozek jî ji ber daxuniyê ku me daye çapemeniyê li Berpîrsê Karê Nivîsaran ê Rojnameyê Salih Taşkesen hatiye vekirin.

Di vê dozê de tiştê balkêş ev e ku tevî banga me jî ji çapemeniya tirk kes beşdarî civîna me ya li ser qedexekirina li OHAL'ê ya Azadiya Welat nebûbû. Civîna li ser qedexekirina rojnameyê jî hêla çapemeniyê ve hêjayî şopandinê

nehatibû dîtîn, lê dozger û polîsan hêjayî şopandinê dîtîbû.

Li aliyê din xebatên ji bo xurtkirina rojnameyê didomin. Li gelek bajarên Kurdistan û Tirkîyê belavkirina rojnameyê zêde dibe. Bi taybetî li bajarekî wekî Ruhayê ku dewlet dixwaze hemû saziyên demokratîk asteng bike, pêşketinên berbiçav hene. Hêdî hêdî bingeha nûnergehê dikemile. Li Mêrdîne jî pêşketinên berbiçav hene. Tê dîtîn ku şaxvedana rojnameyê ya li Kurdistanê bi biryarên waliyê OHAL'ê nikarin bînin astengkirin. Li metropolan pejkariya gelê me ya di warê çand û zimên de zêdetir dibe. Bo nimûne, Komîsyona Ciwanên HADEP'a Zeytinburnuya Stenbolê ji bo piştgiriya rojnameyê kampanya daye destpêkirin. Li gelek navçeyên din jî amadekariyên kampanyayên bi vî rengî hene.

Xuya ye ku dadger û rojnamegerên rejîmê me ji xwe nabînin, wekî rojnamegerên komareke din dibînin, em bi vê yekê kêfxweş û serbilind in.

Ji Çapemeniya Kurd  
(Özgür Politika 27.01.1999)

## Proletera Romayê

## Ferhengok

arîşe: kêşe, mesele	matofî: berhevkirina
bavqocik: dapîr,	karê pembû
kalik	metirsî: endîşe
berendam: aday	nijde: çete
berevanî: parastin,	palehî: tarim işçiliği
mudafa	pêpeskirin: bin-
berzebûn: windabûn	pêkirin
beybûn: naznaz	pexşan: nesir
(papatya)	(düzyazı)
cedew: qewar (nasır)	pergal: sistem
çapkirin: basmak,	qeyran: krîz
neşretmek	rêbaz: azîne, metod
çarenûs: qeder	rêje: oran
deng: rey, oy	sanahî: hêsan, asan
destkarî: mudahale	sind: ôrs
doman: pêvajo	têgih: navlêk, terim
(süreç)	têgihandin: serwex-
endam: aza (üye)	tkirin
ewiqîn: oyalanmak	tikakirin: ricakirin
gotar: meqele	tiyakfiroş: uyuşturu-
helbest: şiir	cu satıcısı
helbestvan: şair	tinaz: qerf (alay)
hîlbijartin: seçim	tîp: herf
hîlbijêr: seçmen	tomarkirin: deng
himat: hol, raste	qeydkirin
kambax: berbat	tomargeh: studyo
karîger: etkin, etkili	wate: yanî
lêhovedan: lê ketina	werganî: wisa, wilo
şikê (süphelenmek)	xilk: asma kilit
lêhûrbûn:	zanist: ilm (bilim)
yoğunlaşma	zanko: zanîngêh,
lengergeh: liman	universite

ABDULLAH ÖCALAN

Demaz li Romayê bûm, min xwest tiştêkî, bêwestan û rawestan bi bîr bixim: Danêrê dewletê mêr e û di bingeha şeran de serdestiya mêran heye. Ev ramaneke nû nîn e, tespîteke gelekî zelal e. Gelşa jinê ji gelşa şer bigire hetanî gelşa aştiyê, ji bo jiyaneke watedar û bedew sererastkirina gelek tiştan e.

Di civaka kurdan de her çiqas bi aloz bixuye jî, di pêşketina mêtîngeriya de mêr xwedî roleke diyarker e. Eger em bixwazin şer jî aştiyê jî bi dest bixin, divê em rastiya mêrê kurd zelal bikin. Ez bawer im ev yek zêde nayê fêmkirin. Lê tîkiliyên di navbera jin û mêr de neteweya me aniye asta qirbûnê. Lewre jî me pêwîstiya pişkafîna pêwendiyên cînsî dît. Ev demeke dûvedirêj e hewldana me ew e ku em kesayetiya jinê ya ku li gorî vîna mêr dirûv girtiye, ji holê rakin...

Di vê serdema dawîn de bi sedan jinan xwe di nava dijmin de teqand. Agir di bedena xwe de heland. Çima? Ji ber ku jiyana ku didin ber wan, napejirînin. Ne ji ber hêvîşkestinê, ji bo ku girêdana xwe ya bo jiyana azad nişan bidin vê yekê dikin. Ji bo wêrekî, fedakarî û azadiya bêsînor...

Va ye li Kurdistanê şoreş li ser vê bingehe bi pêş dîkeve. Bi rastî jî jin çiqasî azad bibe, wateya jiyane jî ewqasî derdikeve holê. Li ser vî esasî tevlîkirina jinê ya nav refên şoreşê, partiya û siyasetê gelekî girîng e û me ev yek bi dorfirehî pêk anî.

Me li şûna jina ku bi mêrê xwe ve girêdayî bû, jina ku bi karê siyasetê radibe, tevlî çalakîyên civakî dibe û tevlî şer dibe, tercîh kir.

Romayê artêşên mezin afirandine,

Eger em bixwazin şer jî aştiyê jî bi dest bixin, divê em rastiya mêrê kurd zelal bikin. Em ji bo ku kesayetiya jinê ya ku li gorî vîna mêr dirûv girtiye birûxînin, tîdikoşin. Tîkiliyên di navbera jin û mêran de neteweya me aniye radeya qirbûnê. Lewre jî me pêwîstiya pişkafîna pêwendiyên jin û mêran dît.

lê bajarekî mêran e. Di dîrokê de jî wiha ye, îro jî wiha ye. Em jî hewl didin ku serdanpê berevajî vî rewşê tevbigerin. Ji jinê pêkanîna lehenge mezînin. Yanî di kesayetiya jinê de afirandina şervaniya lehenga Romayê.

Jiyana ku li ser bîndestîya jinê hatiye lêkirin, hêja nîn e. Eger jiyaneke watedar û bedew bê xwestin, divê jin ji kesayetiya bindest biffîrîte. Divê jin di bin hêza mêr a fişîlê û derûnî de nefetise û ji hêzê nekeve ev pir girîng e. Jinê nasnava xwe bigiranî wînda kiriyê.


Jina ku li Romayê cara pêşîn dîtîm, ez bawer dikim Seroka Komeleya Aştiyê bû. Wekî proletera Romayê ya heyamekê bû, proleter hemdem a Romayê. Têkoşera aştiyê yanî canik tim û tim aştiyê dixwaze. Tiştêkî rast e.

Mêr bi rêxistina şer derdikeve pêşberî me, lê jin jî bi rêxistina aştiyê derdikeve pêşberî me. Têkoşîna ji bo mafê jinan ji bo min evîn û bengî ye. Kar û barên ji bo azadiya jinê pîrozîrîn kar û bar in.

Çawa ku Prometûs agir dizî û di mirovan, em jî hêzê didizin û didin jinê. Mêr hêza xwe ji jinê girtiye. Şelandin heye. Bi dizîna keda karîgeran re çîna serdest pêk tê. Heman tişt jî bo pêwendiyên jin û mêran derbas dibe.

# Stratejiya hilbijartinê li gorî HADEP'ê tê danîn: Li dijî HADEP'ê seferberî

Rêveberê HADEP'ê M. Salih Yıldız: "Emê tûra yekem li 13 bajaran derbas bikin. Di tûra duyem de belkî em li Mêrsîn û Edeneyê bikevin tengasiyê û her wiha li Elezîz û Rihayê. Bi kurtasî % 80'ê biryara hilbijêran diyar e. Her çiqas ew partî di warê merkezî de li hev rûnin jî girse piştgiriyeke mezin dide me. Wekî mînak girseya Fazîlet û CHP'ê li hemberî me dilgermiyeke mezin dide nîşan."



M. Salih Yıldız

yan, ew serî li Lijneyên Hilbijartinê yên Bajaran didin.

## 'Ew ji hêza rêkxistî di-tirsin'

Bêguman dema mirov li tevgerîna saziyên fermî û li gotinên berdevkên dewletê binihêre, dê bibîne ku li dijî HADEP'ê seferberiyek hatiye îlankirin. Serokwezîrê Tirkîyeyê Bülent Ecevit jî berî niha di daxuyaniyeke xwe de li ser îtîfaqên zanînan ku, divê CHP pêvajoya HEP'ê jî bir neke. Li gorî raya giştî û derdorên siyasî ev daxuyanî jî bo HADEP'ê tehdîtek e. Rêveberê HADEP'ê M. Salih Yıldız jî li ser mijarê û hilbijartinên giştî pirsên me bersivandin. Yıldız diyar kir ku ew dê bi tenê li gorî piştgiri û dilsoziya gel bikaribin zorê bidin barajê. Yıldız wiha axivî: "Ecevit diyar e ku berdevkê kê ye. Emê tura yekem li 13 bajaran derbas bikin. Tu problema me nîn e. Di tura duyem de belkî em li Mêrsîn û Edeneyê bikevin tengasiyê û her wiha li Elezîz û Rihayê. Bi kurtasî em namînin tûra duyem, % 80'ê biryara hilbijêran diyar e. Her çiqas ew partî di warê merkezî de li hev rûnin jî girse piştgiriyeke mezin dide me. Wekî mînak girseya Fazîlet û CHP'ê li hemberî me dilgermiyeke mezin dide nîşan."

Yıldız di berdevkê daxuyaniya xwe de li ser têkbirina îradeya civakê diyar kir ku, êrişên li dijî wan li dijî hemû karker û kedkaran in. Wî, da zanîn ku eger HADEP ne di rojêva raya giştî ya navneteweyî de bûya, dewletê nedihîşt ku HADEP beşdarî hilbijartinan jî bibe. Her wiha Yıldız li ser yekitiya belediyyan wiha got: "Daxuyaniya serkaniya giştî (genelkurmay) ya li ser belediyyan tîrsa îfadeya rêxistinîbûnê ye. Îfadeya rêkxistî, tîrsa wan ya herî mezin e. Rast e, eger em yekitiyeke wisa çêkin, êdî emê bi plan û program tevbigerin. Wê dîtina gel a li dijî HADEP'ê beriya her tiştî biguhere. Ev gav hêdî hêdî wê me ber bi îktidara mezin ve bibe. Ji ber wê yekê ye ku rejîm ketiye nava keftûlefteke wekî seferberiyê. Eger ew seferberî jî bo çareserîna probelaman bûya, me yê jî xwe tevlê bikira, lê seferberî li dijî me ye." Wekî dawî Yıldız dixwaze, kesên ku xwe wekî mirov dibînin, dengê xwe li dijî vê seferberiyê bilind bikin.

AZAD ALTUN

camê bidest bixe. Di hilbijartinên herêmî yên sala 1994'an de dewletê hemû berendamên DEP'î yên belediyyan xistibûn binçav. Lewre jî DEP jî hilbijartinên herêmî vekîşiyabû. Di hilbijartinên giştî de di sala 1995'an de dewletê bi riya cahş û tîmên taybet nehişt ku gel li gorî îradeya xwe nûnerên xwe hilbijêre. Her çiqas HADEP'ê li dora 26 mebûs deranîn jî, ji ber baraja % 10 nekete meclîsê. Li gorî derûdorên siyasî dema HADEP di nav meclîsê de cih bigire û bi giranî li Kurdistanê belediyyan bi dest bixe, dê kêşeya kurd bêhtir bikeve rojêva cîhan û Tirkîyeyê. Li gorî rêveberên HADEP'ê jî tîrsa herî mezin ya dewletê ew e.

## Stratejiya hilbijartinê ya dewletê

Li aliyê din ev tîrs û metîrsî ketiye dilê serdestên Tirkîyeyê jî. Lewre jî ji bo eşkerbûna hêza HADEP'ê anketan didin çêkirin. Bo nimûne berî vêga bi demêke rojnameya Yeni Şafakê, anketa berpîrsên ar-

leyman Demirel jî rewşa HADEP'ê anî rojevê û pergala serokatîyê da nîqaşkirin. Wî diyar kir ku divê hilbijartin bi du tûran bê lidarxistin. Balkêş e, ji bo ku hilbijartin bi du tûran bê lidarxistin, divê heta meha adarê meclîs qanûnekê derîne.

Ji aliyê din ve di nav stratejiya hilbijartinê ya dewletê de bi tena serê xwe hiştina HADEP'ê jî cih digire. Di sala 95'an de gelek partiyên siyasî di bin banê Bloka Aştî, Demokrasi û Azadiyê ya HADEP'ê de li hev civiyabûn. Lê îro bi taybetî jî ÖDP di warê hevkarîyê de xwe nade ber hevalbendîya hêzên çepgir û dijber. Partiyên din yên muxalîf jî ji ber metîrsiyên xwe yên siyasî nikarin îezî HADEP'ê bibin.

## Sextekariya partiyên pergale

Digel zordarî û çewsandinan, sextekarî jî bûye parçeyek ji jiyana partiyên siyasî yên pergale. Ji bo ku HADEP di hilbijartinan de bi ser nekeve, bi sed hezaran qey-



têsa tirk ya li ser HADEP'ê weşand. Bi pey anketê dema hilbijartin yektûrî be, dê HADEP li Kurdistanê 71 belediyyên girîng bi dest bixe. Ger hilbijartin dutûrî be, dê HADEP 51 belediyyan bi dest bixe. Li gorî ragihandina Yeni Şafakê tîrsa herî mezin ya generalan, ji van belediyyan pêkhatina saziyeke wekî "Yekitiya Belediyyên Rojhilat û Başûrê Rojhilatê" e. Tê diyarkirin ku dema dewleta tirk beramberî rûdaneke bi vî rengî bimîne, wê hinek tişt ji kontrola rejîmê derkevin. Ji wê yekê jî tê xuyan ku artêş bang li derûdorên siyasî dike û piştgiriye jî wan dixwaze. Wekî din Serokomarê Tirkîyeyê Sü-

diyên neqanûnî ji aliyê partiyên pergale ve tên kirin. Wekî mînak li Kebana Elezîzê di sala 1997'an de nifûs 6 hezar 500 kes bûye, hejmara hilbijêran jî 3 hezar 379 bûye. Lê li gorî hilbijartinên ku dê di 18'ê avrêlê de bê lidarxistin tam wê 6 hezar 610 kes li wê navçeyê reyan bi kar bin. Dîsa li Rihayê jî li dora 17 hezar reyên neqanûnî hatine qeydkirin. Li Stenbolê jî li gorî Lijneya Hilbijartinê a Bilind 100 hezar reyên dubare (mukerer) hatine tespîtkirin. Li ser wê yekê endamê Lijneya Navendî ya HADEP'ê M. Salih Yıldız di-de zanîn ku ew bi pey sextekaran ketine, di her fersendê de ji bo îptalkirina wan re-

Rewşa siyasî ya dewleta tirk roj bi roj ber bi kambaxbûnê ve diçe. Piştî qeyranên dawîn yên li Tirkîyeyê, ji bê-îstikrariya siyasî bigirin heta nehiqûqiyê, gelek hemanên bingehîn yên dewletbûnê, ji ber çaresernekirina kêşeyên hundirîn û derveyî, pergal ketiye nava tengasiyeke dijwar. Bêguman ev yek, ji aliyê gelek siyasîmedarên tirk û her wiha ji aliyê hinek rêveberan ve jî tê bilêvkirin.

Piştî qeyranên tîkiliya di navbera dewlet-çete, mafya-bûrokratên bertilxur, artêş-gladiyo, emniyet-tilyakê de, wê dawiyê jî dewlet ketiye nav qeyrana hilbijartinê. Piştî ku biryara hilbijartinê hate girtin, dewlet û saziyên girêdayî rejîmê, ketine nav hewla afirandina alternatifên ji bo têkbirina îradeya civaka kurd. Di van rojên dawîn de ji serokomar bigirin heta serokwezîr û serkaniya giştî her wiha partiyên siyasî, nivîskar, rojnameger û lêkolînerên şerxwaz û bertilxur, bi nivîs û daxuyaniyên xwe dixwazin rê li ber xweifadekirina gelê kurd bigirin. Vê helwesta xwe bi êrişên xwe yên li ser HADEP'ê didin der.

## Çima HADEP?

Bêguman piştî Pêvajoya Romayê, Kêşeya Kurd dewleta tirk ji aliyê siyasî û dîplomasi ve gelekî tengav kir. Dûre ji aliyê rêveberên PKK'ê ve hate îspatkirin ku dewleta tirk bi PKK'ê re hevdiîtinê veşarî pêk anîne. Di nav wan hevdiîtin û peyaman de navê HADEP'ê jî derbas dibû. Tiştê herî balkêş jî li gorî peyaman, dewletê bi çavê PKK'ê li HADEP'ê dînhîrt. Di peyaman de li ser HADEP'ê bazar di-hate kirin. Wekî mînak di peyamekê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji dewleta tirk daxwaz dike ku asteng li ber xebatên qada siyasî derkevin. Piştî wê yekê bi demêke kurt hemû rêveberên navendî yên HADEP'ê serbest tên berdan. Lê piştî ku tîkîlî tîrî birin, helwesta dewletê li hemberî gelê kurd û HADEP'ê diguhere. Berî vêga bi çar mehan Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak û gelek endamên navendî hatine girtin. Bêguman ev yek ji aliyê kurdan ve wekî sinyalekê hate pejirandin. Li gorî derûdorên siyasî dewlet naxwaze ku HADEP jî hilbijartinan wekî baskê siyasî ya rêxistina IRA, Sin Feinê derkeve pêşberî raya giştî. Her wiha dîsa bi taybetî naxwaze ku ji bakurê Kurdistanê hêzeke hevgerî ya herêmî jî pêk were.

Li gorî tevgerîna dewletê diyar e ku dê serî li gelek riyên kirêt bide. Ji rapora wezîre karê hindurîn jî mirov dikare wê en-

# Kurd di nava çakûç û sindan de

Wekî tê zanîn gelê kurd ji aliye dirokî ve ji welatên Sûriye, Tirkîye û Iraqê yên ku digel Îranê welatê wan dagir kiriye kevntir e. Parvekirina Kurdistanê cara pêşîn di 1514'an de bi Şerê Çaldêranê ye ku di navbera împaratoriye Osmanî û farisan de pêk hat re dest pê kir.

Piştî ku di sala 1916'an de împaratoriya Osmanî bû bêjînga mîrate û ji hêzê ket, îngilîz û frensî bi hinceta ji bin destê Osmanîyan filitandina gelên kurd û ereb, daketin qada Rojhilata Navîn. Lê mixabin, ev soz zû hatin jibirkirin.

Wê demê îngilîz û frensî îcar li ser sînga gelên herêmê rûniştin û bêhna wan çikandin. Zêzewadên gelan xwarin û li gorî Peymana Sykes-Picot di sala 1916'an wan de xaka kurd û ereban li gorî daxwaza dilê xwe û li dijî berjewendiyên gelan perçe kir û sînoren nû danîn. Her wiha xaka kurdan jî di navbera Sûriye û Iraqê de hate parkirin. Ev yek li Rûsyayê xweş hat û Rûsya bédeng ma.

Di sala 1920'an de gelek welatên Ewropa digel welatên Rojhilata Navîn li hev rûniştin, li ser pêşeroj û pêşxistina herêmê rawestiyên. Digel delegasyonên wan welatan delegasyonê kurd jî di bin serokatiya Şerîf Paşa de amade bû.

Di Peymana Sewrê de sê xalan ji bo mafên kurdan û otonomiyê cih digirt. Lê mixabin neviyên Osmanîyan qenciye ku kurdan bo wan kiribûn ji bîr kirin. Her wiha Atatürk ji bo Tirkîyeyê stratejiyêke nû danî. Bi vê re tevaya mafên kurdan bînpê kirin û hêdî hêdî destê xwe avête nava êl û eşîrên kurdan. Ji bo ku doza kurdayetiye bitemirîne êl û eşîrên kurdan berî hev dan û ji hêzê xistin. Di wê serdemê de

Atatürk ji bo Tirkîyeyê stratejiyêke nû danî. Bi vê re tevaya mafên kurdan bînpê kirin û hêdî hêdî destê xwe avête nava êl û eşîrên kurdan. Ji bo ku doza kurdayetiye bitemirîne êl û eşîrên kurdan berî hev dan û ji hêzê xistin.



hemû pirtûk, nivîs û dokûmentên li ser kurdan şewitandin û wînda kirin. Gelek rojnameyên tirkan ên wekî; Milli Yön, Yeni İstanbul û Ötüken dev diavêt kurdan. Bo nimûne, di sala 1967'an de di Ötükenê de Nihal Adsız wiha digot: "Ger hûn dixwazin bi vî zimanê xwe yê genî ku ji 500 peyvî zêdetir nîn e, biaxivîvî û dixwazin ji xwe re welatekî ava bikin û huner û çanda xwe belav bikin, fermo ji axa me derkevin û herin cihekî din. Gelî Kurdno! em tirk ji we re dibêjin: Em vê xaka ku me bi xwîna xwe av daye, wisa bi hêsanî bi dest we ve bernadin. Qey we ji bîr kiriye, me rehê gurcî, ermenî, yewnanî û bîzan-

bînxetê.

Komara Tirk ne tenê kurdî qedexe kir, her wiha her tiştê têkildarî kurdan qedexe kir. Ji şênîyê Melazgirê Mehmet Çakar wiha dibêje: "Gava em ji Melazgirê diçûn bajêr, me egala xwe ji serê xwe dikir û li şûna wê kumikê tirkan dida serê xwe." Bi vî awayî tirkan hin bi hin kurd hînî tirkî kirin. Kesên ku li gorî daxwaza wan tevnedigeriyan dihatin girtin an jî sirgûnkirin.

Zagona Bingehîn a tirkan tu car rê nade ku mîletê kurd bi riya rêxistin û partyên xwe daxwazên xwe yên neteweyî bîne zimên. Li gorî xala 57'an; "divê tevger û partî bi demokratbûna welatê me qanî bibin û tu car bo parçebûna welatê me bang nekin." Li gorî xala 89.; "divê tu partî û tevger tu ziman û çandên biyanî li ser xaka me bi pêş nexin"

Bi vî rengî Destûra Bingehîn lîngê demokratîyê bîriye û rê li ber her kesê ku ne tirk e girtiye.

Di xalên 141 û 142 ên qanûna tawanana de wiha tê gotin: "Tenê daxwaza acizkirin û xerakirina welatê tirkan bi 5-15 salan tê cezakerin" Ev qanûn pîrî caran dema tirk ji hêla kurdan ve dikevin tengasiyê, têne bikaranîn.

Di sala 1994'an wezîrê karê hundirîn ê Tirkîyeyê yê wê demê Nahit Menteşe di parlamentoyê de digot: "Me 2115 gundên kurdan şewitandin." Lê di rastiye de ji 2500'î pirtir gundên kurdan hatine şewitandin. Dewleta tirk di vî şerî de ji şerê Amerîkayê ye ku li dijî Vîetnamê meşandiye, gelekî sûd wer-girtiye. Dewleta tirk a ku endama

NATO'yê ye şerekî gemar bi 500.000 leşker û 150.000 cendirmeyî li dijî kurdan dimeşîne. Li Kurdistanê ne tenê gerîla beramberî kuştin û îşkenceyê dimînin. Kal, pîr, zarokên berşîr; teyr, tilûr; dar, ber û zevî jî tene kuştin, şewitandin û wêrankirin. Dibêjin: "Em bi terorîstan re şer dikin." Gelo di dirokê de kê zarokên berşîr, teyr û teba wekî terorîst pejirandiye?

Wan 57 hezar kurd kiriye cerdevan. Bi çek, pere û bi tirsê li dijî tevgera kurd bi xwe ve girêdane. Îro li Kurdistanê tu malbat tune ye ku bav an jî kur nehatibe kuştin, windakirin. Loma jî îro gelê kurd bi piraniya xwe li dijî neviyên Osmanîyan piştigiriya Tevgera Neteweyî dike. Li gorî hin rojnameyan 1.700.000 kurd bûne penaber. Piraniya wan bê cih û war in. Zarokên binê pireyan bi sir û seqema çile mezî dibin û ji ber nexweşiyê dimirin.

Zordarî û xwînmijîya dewleta tirk li cihanê deng daye. Dewletê di 1993'yan de xwest ku Xelata Aştiyê ya Atatürk bide Nelson Mandela. Mandela ev xelat red kir û li ser pîrsa rojnamegerekî wiha got: "Herin sê rojan bibin kurd û paşê ji min bipirsin çima te hilnegirt."

Bi taybetî xebatên kurdan ên li derve, kuştina rojnamegerên kurd û girtina parlamenterên kurd bû sedem ku cihan ji rastiya kurdan bihesê. Lewre jî dema ku dewleta tirk dixwaze têkeve Yekîtiya Ewropayê beramberî kêşeya kurd, pêpeskirina mafên mirovan û hwd. dimîne.

Dewleta tirk a ku endama NATO'yê ye şerekî gemar bi 100 hezaran leşkerên xwe li dijî kurdan dimeşîne. Li Kurdistanê ne tenê gerîla beramberî kuştin û îşkenceyê dimîne. Kal, pîr, zarokên berşîr; teyr, tilûr; dar, ber û zevî jî tene kuştin, şewitandin û wêrankirin.

İsmet Paşa di axaftineke xwe de wiha digot: "Li vî welaî ji bilî tirkan mafê tu kesî yê neteweyî tune ye." (Rojnameya Milliyet, 19. 9. 1930) Dîsa di heman demê de Wezîrê Dadê Mahmut Esat Bozkurt digot: "Ez bawer im û hêvîdar im, dost û dijmin û çiya jî divê zanibin begên vî welaî bi tenê tirk in. Li vî welaî ji bilî kolebûnê tu mafê kesê ku xwîna tirkan tê de nîn e, tune ye. Azadiya vî welaî li tu deverên cihanê tune. Ev der Tirkîye ye." (Milliyet, 19. 9. 1930)

Ev helwesta hovane piştî vê demê roj bi roj tûjtir dibe. Ne tenê ev, tirkan

siyan ji kokê ve rakir. Herin Îranê, Pakîstanê, cem Barzanî, dozê li UNO'yê bikin bila li Afrîkayê welatekî bide we."

Franz Werfel di pirtûka xwe ya bi navê "Li Çiyayê Mûsa Çil Roj" de qala zordariya tirkan û tevkujîya ku li ser ermenan pêk aniye, dike. Piştî qelandina ermenîyan dor hate kurdan. Bo nimûne, di dema civîna otonomiyê de 14 serokeşîrên kurdan hatin kuştin. Gelek gund û bajarên kurdan şewitandin. Kurd bi zorê koçber kirin. Lewre li Dêrsimê xwîna laş diajotin. Wê demê 16000 kurd revîn û daketin

Kêşeyeke li pêşberî zimanê kurdî

# Ferhenga zanist û teknolojiyê

Nivîsên teknîkî gelek pirsên aloz bi xwe re tînin; ji "gelo afirandina ferhengoka teknîkî ya kurdî pêwîst e?" bigire, heta bi pirs "ewê çawa bê afirandin?"

Zimanê kurdî bi van arîşeyan re hevrû dibe, lewre zimanê kurdî ji mêt ve di bin zordariyê de ye û li hinek parçeyên Kurdistanê bi deh salan e ku bikaranîna zimanê kurdî di qada gelemperî de hatiye qedexe kirin. Vê berbenkirinê, zimanê kurdî aniye sinorê berzebûnê, hinek kes zimanê kurdî dixin nav zimanên di xetereyê de.

Afirandina ferhenga teknîkî ne kêşeyeke kurdî bi tenê ye. Heta zimanên mîna zimênên ewrûpî yên pêşketî (wekî frensî) ji bi heman kêşeyê re hevrû dibin. Bo nimûne pisporên frensî nûjenkirina ferhenga xwe bi peyvên mîna CD (compact Disk), HT TP (hypertext transfer protocol) û tîgîhên ku bi teknolojiya nûjen re belav dibin, nîqaş dikin. Ev mînak ji bo derpêşkirina hinek arîşeyên hevpar ên li ber zimanzan û sazûmankarên zimên bes e. Hinek kêşeyên girîngtir ên ku divê mirov hilde dest he-

## Kêşeyên sereke

Nivîsarên kurdî yên teknîkî du kêşeyên sereke bi xwe re tînin. Mirov

dikare kêşeya yekemîn bi pirs "Di vê heyama ku zimanê îngilîzî (qet nebe şeweyekî wî) bi lez xwe wekî zimanê zanist û teknîkî ê cihanî dide pejrandin de, gelo pêwîst e ku mirov ferhenga teknîkî ya zimanê kurdî pêk bîne? Wate, ji bo vî karî pêdiviyeye xurt heye gelo? Heke bersiv erê be, piştî vê îcar kêşeya duyemîn a sereke tê himatê, dê bi kîjan rêbazê ew tîgîhên bîn afirandin an jî ji kîjan zimanan bîn wergerandin?"

Dibe ku gelek sedem hebin da ku li Kurdistanê zimanê îngilîzî di perwerdehiya zanîngêhê û perwerdehiya di ser wê re wekî zimanê teknîkî û zanistê bê pejrandin. Berî her tiştî dibe ku hejmarra berhemên di warê zanistî û teknîkî de tîrê nekin ku saziyên lêkolînî bigihêjin asta navneteweyî, lewre ji pêwîstî bi îngilîzî bimîne. Ji ber vê sedemê pêkan e ku Îngilîzî mîna zimanê teknîkî yê mirovên ku di rêza pêşin a karê zanistî û teknîkî de cih digirin be. Li nik vê yekê, dibe ku zimanê teknîkî yê navneteweyî wekî navgîna danûstandinê were dîtin û ji zimanê îngilîzî bê cudakirin. Lê dîsa ji çî dibe ew zane, afirandina ferhengeke teknîkî û zanistî ya zimanê kurdî bo perwerdehiya di asta zanîngêhê de û ji bo ku raya giştî ji cihanê dûr nekeve û literatûra cihanê bişopîne, pêwîst e.

Li Başûr ji ber ku bi deh salan e per-

werdehî bi zimanê kurdî tê kirin rewşa nivîsandina bi kurdî baş e. Vê perwerdehiyê mercên wergerandina bi dehan berhemên zanistî û teknîkî çareser kiriye. Digel vê yekê derfeta nivîsandina berhemên bi kurdî di warê zanist û teknîkî de ji bi dest hinek kesan ketiye. Pêdiviya pêşin a bipêşxistina dibistanên zimanê kurdî yên zanist û teknîkî afirandina tîgîhên zanistî û teknîkî ne. Ji bo pêşketina ferhenga navborî hinek karên bingeh danîne hatine kirin. Lê belê di vê roja îroyîn de ku pêşketineke bi lez a ku zorê dide zimanekî wekî frensî heye û bi sedan peyvên nû derkevin holê, bingeha heyî tîrê nake. Lewre ji bo kurdî afirandina ferhenga cîhana zanist û teknîkî pêdiviyeye acil e. Her wiha bipêşxistina zimanê teknolojiyê û zanistê di kurdî de karekî bingehîn e.

## Rêbaza afirandina peyvan

Em werin ser pirs duyemîn. Kîjan tîgîh, bi çî rêbazê divê pêşî bîn afirandin/wergerandin. Rêz û rêçika vê yekê çî ye? Lê ev, ne pirseke ku mirov nikare çareser bike ye. Kurd dikarin li ser ez-mûnên zimanê xwe û zimanên cîran bi taybetî ji tirk, ereb û farisan bi vî karî rabin.

Her wiha pragmatîzma îngilîzî ji dikare rê nîşanî kurdan bide. Zimanê îngi-

lîzî xwe bi riya wergertina peyvên ji zimanên din dewlemend dike. Di kurdî jî di nava van zimanan de ye. Bo nimûne peyvên mîna pêşmerge, cahş, an jî enfal di îngilîzî de ji xwe re cih dîtin. Van peyvên cihê xwe ji peyvên hemwate yên îngilîzî re nehiştin, lê digel wan tîne bikaranîn. Bo nimûne peyva pêşmerge bi xwe re peyva "freedom fighter (şervanê azadiyê) tîne." ew jî bi tenê tê wateya şervanê azadiyê yê kurdan.

Mînakeke din jî peyva întifada ye ku tê wateya serhildana gelêrî ya filistinîyan. Her wiha bo gelên din ên mîna kurdan jî tê bikaranîn. Wekî mînak serhildana kurdên Tirkiyeyê wekî "întifadaya kurdan" hatiye binavkirin.

Her wiha, berfirehkirina wateya peyva biyan di mînaka "solidarity (piştgi-ri)" de xwe bi awayekî zelal dide der. Ev peyv pêşî ji bo berxwedana karkerên polonî yên Lengergeha Gdanskê hate bikaranîn, lê piştê bo berxwedana welatparêzî ya hemû gelan hate bikaranîn.

Xuya ye ku mînakên jor ne tîgîhên zanistî û teknîkî ne. Lê ji bo tiştê girîng di îngilîzî de nîşandana rêbaza bidestxistina peyvên biyanî û awayê bikaranîna wan e. Lewre kurdî jî dikare ji vê rêbazê sûde wergire. (Dê bidome)

RÊBIWAR FATAH

WERGER: SAMÎ BERBANG

## Hilbijartin û kurd (1)

NEJDET BULDAN



E-Mail: Buldan@compuserve.com

Di jiyana civakan de cihê hilbijartinan gelekî girîng e. Hilbijartin kulturek e ku mirov rêveber û nûnerên civakî û sazgehî û dewletî kifş dike. Encamên hilbijartinan neynûka kultura civakê ne. Hilbijartinan berpirsî ye. Ew kesên ku tînan hilbijartinan berpirsiyê mezî digirin ser milên xwe. Kesên ku dengên xwe didin yanî hilbijêr, nûnerê wijdana xwe eşkera dike. Hilbijartin dîtina mirov a siyasî, aborî û kulturî ye. Kurtiya wê deng û îradeya mirovan e. Kerb e, înad e, dostanî ye û dijminatîyeye demokratîk e. Xwestineke jidil, nevêyanê siyasî ye.

Ji bo kurdan û azadîxwazan girîngiya hilbijartinan zêdetir e. Ew xebatek e ku îsbata hebûn û nebûnê ye; helwestek e ku bersiva îşkence, koçberî û kuştinê dide. Li ser hilbijartinên li pêşiya me emê çend caran bisekinin. Pêşiyê hilbijartinan baladiyeyan di rojê me de ye. Serokê belediyeyê, endamên meclîsa wê, nûnerên meclîsa bajêr û muxtar.

Hewce nake ku mirov qala tîkoşîna neteweyî bike. Lê pêwîst e ku em hemû bizanin ku ev hilbijartin jî mîna şerê çekdarî, mîna dîplomasiya derve bi tîkoşîna neteweyî ve girêdayî ye. Hilbijartin li hemberî dewleta tirk û raya giştî ya cihanê helwestek e. Helwest e ji bo ku raya giştî hebûna kurdan qebûl bike, helwest e li dijî zilm û zora dewleta tirk. Helwest e li hemberî îxanetê. Bersiva nîjadperestiya tirk, bersiva xwefirotinê ye. Helwest e li dijî kesên ku nûnertiya gelê xwe difiroşin.

Dibe ku gelek kes bibêjin, kesên ku ji HADEP'ê tînan hilbijartinan çî arîkariyê ji dewletê nastînin. An jî dewlet nahêle ew kes bixebitin. Erê em dizanin ku gelê Kurdistanê pêwîst bi xizmetê heye. Hingî jî bersiva me sanahî ye. Gelo, heitê û pênc sal in kurd bi destê kesên ku arîkarî ji dewletê wergirtî tînan temsilkirin, wan çî xizmet ji bo gelê xwe kiriye? Heke wan riyek çêkiribe, bihayê deh rîyan jî havêtiye bêrika xwe. Paşê ji bo kurdan êdî xizmeta madî çî girîngiya xwe heye? Mirovên ku mafên wan ên mirovî yê neteweyî di bin piyan de bin, tiştên madî ji bo wan çî qîmet heye? Mafên neteweyî, yên mirovî qedexe kiribin, bajarên wan tev di nav zêr û zivan de bin jî tê çî wateyê? Nûnertiya ne tî-

xizmetkirina rê, pire, av û avahiyan e. Nûnertiya parastina mafên mirovî û neteweyî ye jî.

Gelek serokên belediyeyan serokcehş in. Endamên nijdeyan, bazirganên heroyînê û xwîna gelên xwe ne. Muxtar, endamên meclîsên belediyeyan û endamên meclîsa wîlayetê jî her wisa. Heke hilbijartin, neqandina endamên çeteyan e, wî karî dewlet pêk tîne. Heke hilbijartin ya rêis çêşan e, pêwîst nîn e ku ji bo wê hilbijartin bête kirin. Ji bo gundsotî û valakirinê, ne hewce ye ku em hilbijartinan bikin.

Pêwîst e ku gelê kurd van hilbijartinan baş fêhm bike. Mesele parastina mafên neteweyî ye. Mesele namûs e. Heke em ji bo rewşeke ku heta niha hatiye û dê her wisa biçe dengê xwe bidin, partî pir in, qatîl pir in û saziyên wan pir in.

Heke em dixwazin mafên neteweyî bîn parastin, di qada navneteweyî de qala kurdan bête kirin, tola kuştîyên xwe, koçberiya xwe vekin, namûsa xwe ji bin piyan bînamûsan derxin, pêwîst e ku em dengên xwe bidin HADEP'ê. Heke bi ser bikevin baş e, ekstra ye. Heke bi ser nekevin, em nabine hevalên zilimkaran û xayînan. Ew jî rûmetek e.

## Serpêhatiyên Gerîlayê Biçûk:

## Rêbazên dedektîfî

**B**ülent Bayram (Bager) ji malbateke welatparêz e. Di dema zarokatiya wî de her kesî hez jê kiriye û pê şa bûne. Lê hîna di wê demê de ji ber ku neyarê xwe başbaş nas nekiribûye, hay ji rastîya gel û welatê xwe nebûye. Bager, rojekê bêşûc û sedem ji aliyê polîsan ve tê girtin û îşkenceyên xedar lê têne kirin. Ji ber vê serpêhatiyê Bager di wî temenê xwe yê biçûk de, rûyê gemarî yê dijminê xwe dinase. Lewre gir û kîn li dijî neyar di dilê wî de gur dibe. Li ser vê yekê derdora xwe jî agahdar û zana dike.

Mala Bager li Mêrsînê bû. Loma ew şerpezetî û xizaniya kurdên koçber bi çavê serê xwe dibîne. Kurdên koçber di bexçeyên porteçal, limon û zeviyên marol, pembû de jar û perîşan dibûn. Bager, bi vê yekê gelekî diêşe û dikeve taya peydakirina çareseriyê. Dawiyê biryara xwe digire û di sala 1988'an de tevî refên gerîla dibe. Piştî perwerdehiyêke dûvedirêj, du salan li pesarê (kîrsal) dimîne. Di van du salan de Bager dide pey rêz û rêçikên Partiyê lewma pratîkeke pêk tê. Peyre di sala 1990'î de ji bo karûbarê metropolan tê wezîfedarkirin û li Mereşê karê gerîlatiya nav bajêr digerin. Di heşt mehan de koma gerîlayan, ku Bager jî tê de ye, li Mereşê çar çalakîyên girîng pêk tîne. Di van çar çalakîyan çar erebeyên dijminên rûxandin. Cara dawî ew diavêjin ser nizamiya leşkerî, 12 heb leşker û serhengêkî (albay) dikujin. Di vê çalakîyê de du gerîla jî jiyana xwe ji dest didin.

## Dema xebata li metropolan

Piştî xebata li Mereşê Bager karê xwe li Edeneyê dimeşîne. Ji ber ku biçûk e, hevalên wî jê re dibêjin; "Gerîlayê Biçûk". Gel qedre wî digire û gelekî hez jê dike. Bi tevgera xwe ji bo gel dibe kana dilgeşî û moral e. Li aliyê din bi tevgera xwe kesên xayin û xwe-firoş jî çavtirsandî dike. Dema ev kes navê Bager dibihîzin tirs û saweke diwar li wan radişe. Tevî hemû xebat û hewldanan jî dijmin bi Bager nikare.

Dema mirov bala xwe dide ser serpêhatiyên Bager şaş û metel dimîne. Lewre filmên dedektîfî tînin bîra mirov. Ji ber ku gelekî jîr û jêhatî bûye. Mirov di ber xwe de dibêje: "Çawa ji van kemîn û xafikan filitîye?" Rojekê li ser îxbarê, polîs dora mala ku Bager lê dimîne dorpeç dike. Bager dibîne ku xelasî ne mimkûn e, radihêje qelesa murakebeyê (kontrol kalemi). Pêşin tiliya xwe xwîn dike û peyre xwe bi prîzê ceryanê ve diawiqîne. Dema polîs dikevin hundir, tiliya bi xwîn a Bager



Bülent Bayram (Bager) di 21'ê kewçêrê sala 1998'an de li Girtîgeha Semsûrê agir berda canê xwe û jiyana xwe ji dest da.

dibînin û jê dipirsin: "Tu kî yî? Li vê derê çi digerî?!" Bager qet tu tişt di heynê xwe de nayne der û li polîsan vedigerîne: "Ma hûn nabînin ku ez kî me û çi karî dikim!" Li ser vê yekê polîs jê lêborîna xwe dixwazin û dibêjin: "Li me bibore! Me pê nizanibû ku tu elektrîksaz î"

Dîsa rojekê piştî çalakîyê çekdarî polîs didin pey Bager û dorê lê teng dikan. Dema ji polîsan direve, li kolanê li zarokên ku bi xarê (bilye) dilfzin rast tê û dikeve nava wan. Bi wan re xar dilfze û hema ji wan sêçar xaran kar dike. Dema polîs tînen cem zarokan, qet li Bager ho venadin û lê dixin diçin

Carekê dîsa Bager û hevalekî wî piştî nivê şevê ji Taxa Anadolûyê diçin Gülbahçeyê. Di rê de polîs li kuçeyê kor (çikmaz sokak) pêşiyê li wan digire. Li ser vê yekê hevalê Bager dibêje: "Bager, tu bireve xwe xelas bike! Ez ê bombeyê di xwe de biteqînim!" Lê Bager vê pêşniyara hevalê xwe red dike û wiha bersivê didê: "Berî ew bang li me

bikin, em ê biçin ba wan." Hevalê Bager matmayî dimîne û dibêje: "Ewqas dokûman li ba me hene! Em ê çawa herin ba polîsan! Jixwe bûye derengiyê şevê..." Lê Bager qet guh nade gotinên hevalê xwe û berê xwe dide polîsan û dibêje: "Memûr Beg! Em dê çawa bikaribin herin Taxa Akkapyê?" Polîs jî yekser bi tiliya xwe Taxa Akkapyê nişanî wan dide, ew jî berê xwe didin wê derê.

## Laşê wî li pey panzerê gerandin

Bager gerîlayekî mirovperwer bû û ji gelê kurd pir tişt hêvî dikir. Lê kêfa wî qet ji bêbextan re nedihat lewre digot: "Mirov çi dibe bila bibe, lê divê bêbext nebe!" Li aliyê din Bager her çiqas hatibûye nav bajêr jî, li gorî şertên jiyana gerîla tevgeriyaye. Lewre gotiye: "Divê gerîla li her derê gerîla be. Ger gerîla ji pesarê dakeve bajêr û têkeve nava nivînen nerm, wê demê pilê wî dê biqede." Ji ber vê yekê Ba-

Serpêhatiyên Bager filmên dedektîfî tînin bîra mirov. Rojekê polîs dora mala ku Bager lê dimîne digire. Bager radihêje qelemê kontrolê, tiliya xwe xwîn dike û xwe bi prîzê ceryanê ve diawiqîne. Dema polîs dibêjin: "Tu kî yî?" Bager dibêje: "Ma hûn nabînin ku ez kî me!" Li ser vê yekê polîs jê lêborîna xwe dixwazin û derdikevin.

ger tu caran di nava nivînan de raneketiye, her dem li ser merşikeke hişk radiketiye û bi vî awayî tevdira xwe digirtiye.

Bager kula kurdan rast diyar kiribû û lewre jî qet li ajan û xwe-firoşan av nedixwar. Lê girtina wî piştî cezakirina ajanekî pêk hat. Li pey ragihandinê, notirvanekî bexçeyan, ku wekî agirê bin kayê kar dike, bi dijmin re dide û distîne. Li ser vê yekê ev kesê ajan piştî ku tê hişyarkirin, tê kuştin. Piştî vê çalakîyê Bager tê girtin û 28 rojan îşkence lê tê kirin. Polîs mala ku ew lê hatiye dîtin bi "hewandin û alikariyê (yardîmçîyê)" tawanbar dike lê ew dibêje: "Wan bi zora çekê ez hewandim." Polîs bi Bager nikarin. Dawiyê wî li pey panzerê girêdidin û li taxên ku kurd lê hene digerin. Peyre ew tê darizandin û 35 sal ceza lê tê birin. Ew li pey hev li girtîgehên wekî Amed, Konya û Semsûrê dimîne.

Navê Bager (Bülent Bayram) piştî ku li dijî kompoloya li ser Serokê Gîstî yê PKK'ê Abdullah Öcalan agir berdan laşê xwe, kete rojeva Kurdistanîyan. Bager di roja 21 kewçêrê sala 1998'an de li Girtîgeha Semsûrê agir berda laşê xwe da û roja 22'an ber bi refê pakrewanan ve firiya û tevî wan bû. Bager li pey hev hiltînin Nexweşxaneyê Semsûr, Dîlok û Edeneyê lê li her sê nexweşxaneyan jî tedawiyeke têr nakin. Dawiyê li Nexweşxaneyê Balcalîyê ya li Edeneyê bi hinceta ku cih lê nemaye bi tenê serûmekê lê girêdidin û dişînin Nexweşxaneyê Dewletê ya li Edeneyê. Laşê Gerîlayê Biçûk ji sedî sed şewitîbû.

□ 30.01.1994:

**Axîna Welat  
dest bi weşanê kir**

Rojnameya 15 rojî Axîna Welat li Moskovayê dest bi weşanê kir. Armanca wê, danasîna Tevgera azadiyê li welatên Sovyeta Berê û xurtbûna hestên neteweyî ya kurdan e. Rojnameya çandî-siyasî Axîna Welat, bi xebatên rojnamevanên wekî Ezîzê Cemo, Bavê Nazê, Hejar, Çerkezê Reş û Ehmed Botan ji 16 rûpelan pêk tê.



□ 31.01.1919:

**Kovara Kurdistan  
dest bi weşanê kir**

Kovara Kurdistan li Stenbolê ji aliyê Mihemed Mihri Hilav ve hate weşandin. Kovarê li ser ilm, civak û edebiyata kurdî weşan kiriye. Kovara Kurdistan bi temamî 37 hejmar derketiye.

Li gorî hin kesan, kovara Kurdistan, ne di sala 1919'an de, di sala 1918'an de dest bi weşanê kiriye.

# Mihabad û Mihemed hatin bibîranîn

Komara Mehabadê ya Kurdistanê û serokê wê Qazî Mihemed hatin bibîranîn. Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi boneya 53'yan salvegera avabûna Komara Mehabadê semînerê li dar xist. Panela ku ji aliyê endamê Komîteya Rêveber a Înstîtuyê Mulazim Özcan ve hate birêvebirin, roja 23'ê rêbendanê li Gesam (Genç Ekin Sanat Merkezi) pêk hat.

Beşdarên panelê F. Huseyn Sağniç û Gerinendeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan, bi giştî li ser kesayetiya Qazî Mihemed û sedemên têkçûyîna Komarê rawestiyên û xalên balkêş destnîşan kirin.

F. Huseyn Sağniç di destpêkê de bajarê Mehabadê hinekî li ber çavan raxist. Wekî tê zanîn, bajarê Mehabadê li Rojhilatê Kurdistanê yanî li parçeyê di bin destê Îranê de ye. Her wiha wî çaxî Îran bi destê Riza Şah dihate rêvebirin.

Sağniç bal kişand ser demokrasiya li Mehabadê ya piştî ku Komara Kurdistanê hate avakirin û diyar kir ku li wir ji bilî kurdan gelek gel ligel hev dijiyan wekî ecem, nastûrî, cihû û hwd.

Sağniç li ser şexsiyeta Qazî Mihemed rawestiya û da zanîn ku piştî mirina bavê xwe ew bûye qaziyê fermî yê Mehamadê. Sağniç got ku şexsiyeta Qazî Mihemed şexsiyeteke ewqas rast, durist, binamûs, cidî û dilsoz bû ku encax melaîket wekî wî dibûn; ew timî li dijî xerabiyê û nebaşiyê derketiye.

Li herêma kurdan a ku wê demê bandora Sovyetîstanê li ser bû, ji aliyên çend kesan ve bo rêxistîneke neteweyî xebat tene kirin û Partiya Ko-

mela tê avakirin. Her wiha navê partiyê bi peşniyaza Sovyetê tê guhartin û bi armanca ku berferehtir bibe, navê wê wekî Partiya Demokrat a Kurdistanê tê guhartin. Wî çaxî Qazî Mihemed ji dût ve di nav van xebatên Partiyê de ye. F. Huseyn Sağniç got ku piştî ku Qazî Mihemed kete nav xebatên partiyê bi ûris re têkilî danîne, di encama van têkiliyan de li hev hatine û qerar dane ku komarek were avakirin. Di encamê de Komara Mehabadê roja 22'ê rêbendanê li Meydana Çiwarçira bi beşdarbûna 10 hezar kesî ji aliyê Qazî Mihemed ve tê îlankirin.

Sağniç axaftina xwe wiha berdewam kir: "Piştî avabûna Komara Mehabadê, Mele Mîstefa Barzanî jî tevî 10 leşkerên xwe derbasî Mihabadê dibin û dixwazin ku ji bo dewleta komarê bibin hêzên çekdarî." Her wiha Sağniç bal kişand ser vê yekê ku di nav wan de têkilî bi temamî eşîrî bûn, qîm nedikirin.

**Komarê çawa?**

Sami Tan ku li ser aliyên cihê ê komarê sekinî got ku ligel daxwaza Kurdîstaneke serbixwe dihat kirin jî, ev jî aliyê Sovyetîstanê ve nehatiye pejirandin. Tan wiha got: "Di resmîyetê de wekî komara otonom dihate binavkirin lê di nav xwe de serbixwe bû, ji ber ku di tu otonomiyên de serokomar, meclîs, wezaret û hwd tune ne. Lê li Komara Mihabadê heta bi wezîrê berevaniyê jî bigihêje hebûn. Li gorî Tan, mirov dikare rewşa Komara Mehabadê bişibîne rewşa niha a başûrê Kurdistanê. Tan ev babet wiha nixand: "Bi taybetî di warê perwerdehiyê de, di çandê de, gelek gav hatine avêtin. Heta ji bo zarokan du kovar bi navê 'Gilale' û 'Halele', ji bo perwerdehiyê pirtûk û hwd. hatine derxistin."

**Ji bo çi komar têk çû?**


Li gorî Sami Tan sedemên têkçûnê ne tenê Sovyetîstan ligel wan sedemên hundirîn jî hene. Wekî bîrêxistinnebûyîna, nezaniya hwd. Tan bal kişand ser şexsiyeta Qazî Mihemed û got ku ew kesekî gelekî dilpak bûye û ji bo parastinê xwe ji şer re amade nekiriye. Tunebûna artêşêke pişpor û timî, nişana vê yekê ye. Li gorî Tan, ew leşker ji serokatiya komarê zêdetir girêdayî serokê eşîran bûn.

Tan di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Yekîtiya Sovyetê qerara ku dabû neanî cih û alîkariya çekan nedaye komarê. Piştî ku Sovyetîstan ji herêma vekîşiya, tu rîya parastina komarê jî nema."

Belê temenê Komara Mihabadê ya Kurdistanê bi 11 mehan bi sînor dibe. Piştî vekîşina Sovyetîstanê hêzên Îranê dixwazin kurdan ji wir der bi-

**ÇAVDÊRÎ**

## Gera Serok û fîlozofê awistûrî



MÎRHEM YÎÇIT

Serok ji Romayê derket, li ku ye, rawestgeha ve carê navê wê çî ye, hê ne diyar e. Ev bûye dabaşa meraq û texmînan.

Gelek tişt tene gotin, navê gelek welatan derbas dibe. Siyasetmedar û birêvebirên dewleta tirk mîna mirîşka tu serê wê jêkî, li wan hatiye, gêj bûne, dewixîne.

Li gorî serokê MIT'a yê demekê Mahir Kaynak tapkirina cihê Serok li derveyî taqet û karîna îstixbarata tirkan e.

Ji awira me kurdan û giş rewşên xwedî mesûliyet ku nan ne bi guhên xwe dixwin, zanin bê roj di ku re derdikeve û çawa diçe ava, tiştêkî bêminaqeşe heye.

Serok li ku dibe, coxrafya ew lê dût be, nêzik be, navê wê Ewrûpa, Asya, yan jî parzemîneke din be ferq nake. Ew di dilê me de ye û ew serokê me ye û em jî em dê bi dil û can pê re bin. Heta ew bi gel û welatê xwe re ye û ji bo vê qîma xwe bi her dijwarî û pêşîngiya şexsî tîne, em jî em dê pê re bin, em dê jê re bibin zirx û em dê fermanên zordar û dinyaxwiran nepejirînin.

Çendî meh dibihurin, xelekên sefer û sekna Serok dibin zerazeng, yê me jî ewçendî bawariya me bi Serok û mezinahiya wî zêdetir dibe û ew, çendî rûmet û serbilindiya me ye çêtir tê dîtin.

Bûyerên paş Roma û gera Serok ji cihêkî ber bi yên din de çend tişt zelaltir kirin û bi nîqaşkirina wan bêwate kir:

1- Çavên me hinekî din vebûn û em hinekî din bi naîvbûn, kawik bûn û bi dilkeçîtiya xwe hesiyan.

2- Sîstema Lozanê ku navneteweyî û Ewrûpî ye, ji qurm de hejiya. Ev peyman û sîstem çendî li ser bingeheke neheq, nerealîst û nesaxlem hatiye avakirin, derkete meydanê û ji nû ve serastkirin û reorganîzekirina wê xiste rojevê.

Fîlozofê awistûrî Karl Popper navê biyografyaya xwe kiriye 'Gera Berdewam', gera li heqîqetê. Gera li rastî û li heqîqetê tim û tim, daîmî ye. Ev ger qet pîr nabe, çendî pîr dibe ewçendî jî xurtir dibe. Tim li ser rê ye, li cihêkî raweste, bêhna xwe veke, qeyalan bide jî nasekine. Heqîqet û rastî bi îsra e, bi hêz e û tu carî ji ser a xwe nayê xwarê. Ew tim serbilind e, xwediyê eniya vekirî ye û dawîya dawî bi ser dikeve.

Serok nûnerê rastiyê ye, di dû rastiyê de ye û sefer û meşa wî, zû yan dereng dê encama pêwîst bide.

kin lê Qazî Mihemed ve napejirîna lê ji bo ku mirov neyên kuştin şer jî nake û xwe feda dike.

Tan di vir de bal kişand ser dijderneketina Qazî Mihemed ku ji bo şer dernekeve û got ku wî ji bo ku mirov neyên kuştin xwe feda kiriye. Sami Tan wiha got: "Ew bûye qurbanê dilpakîya xwe, ji ber ku ji bo berevaniya komarê tu politîka nehatine meşandin."

Wekî tê zanîn Serokê Komara Mihabadê Qazî Mihemed roja 17'ê berfanbara 1946'an li Meydana Çarçirayê tevî birayê xwe Mihemed Seyfî Qazî û kurapê xwe Abdulqasim Sadîrî Qazî tene dardakirin û Komara Mehabadê jî difelişe.

HEVPEYVÎN: SERKAN BRÛSK

**M**amoste te çawa dest bi helbestê kir. Zêdetirîn çi tesîr li te kir?

❖ Di malbata me de, rûmeta folklorê kurdî gelek mezin bû. Tu dizanî bê helbesta min ya pêşî çawa bû? Di dawetana de me govend digirt û di ber govendê re em distriyan. Dema kilam diqediyana, min ji ber xwe ve li kilamê zêde dikir. Her çiqas min ew nenivîsandin jî, lê ez wê demê wekî destpêkirina helbestvanîya xwe dihesibînim.

Dema ez li dibistanê bûm, gelek kitêbên bi kurdî di mala me de hebûn. Ji ber ku birayê min yê mezin mamosteyê zimanê kurdî bû, fêdeyê mezin gihan-de min. Ew bi xwe jî nivîskar û helbestvan e. Wî, pirtûkxaneyê mezin di mala de avakiribû. Hemû pirtûkên ku li Yekîtîya Sovyetan hatibûn çapkirin di mala me de hebûn. Dûvre jî gelek pirtûkên bi zimanê rûsî û ermenî hebûn. Min giş dixwendin.

Min hîna di destpêka dibistana navîn de hinek tişt nivîsandin lê ne ji bo belavkirinê bûn. Di dema zankoyê de jî min helbest dinivîsandin lê dîsa jî nedihat bîra min ku ez wan çap bikim. Wê demê min û Ûsivê Fêrikê helbestvan bi hev re dixwend. Dema min helbestên xwe ji wî re xwendin, wî got wan çap bike. Min hem zankoya fîzîk û matematîkê dixwend û hem jî di rojnameya Riya Teze de gotar dinivîsandin. Piştî min çend pirtûkên xwe weşandin.


*Wek tê zanîn di dîne kurdên me yê êzîdî de ruhekî kurdî heye. Helbestên te çiqasî ji vê çanda bi kurdî para xwe wergirtiye?*

❖ Edebiyata kurdên Sovyetê di salên sihî de dest pê kir. Di vê demê de têkiliyên me bi beşên din yê Kurdistanê re tunebûn. Kesî nizanibû li wir çi tê nivîsandin û belavkirin. Her wiha haya me jî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran tunebû. Hinekan nivîsiye ku edebiyata kurdan a nivîskî di salên 30'î de li Sovyeta Kevn dest pê kiriye. Kesên ku di van salan de nivîsandine jî, di bin bandora nivîskarên ermenî û rûsan de mane. Stîl û pîvanên wan bikar anîne. Awayê kurdî di wê demê de tunebû.

Dema min dest bi nivîsandinê kir, bi salan pirtûkên min çap nekirin. Pîvana ku min pê dinivîsî ne wekî ya wan bû. Tevî ku min Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî nexwendibû jî, min bi awayê zargotîna kurdan nivîsandibû. Lê awayê min serbest bû. Ez bi awayê xwe yê serbest ji kilamên govandan û stranên mêraniyê vediqetiyam. Ev stîl ya ewrûpî û rûsan bû, lê ez ne li pey wê bûm ku wekî wan binivîsim. Ya ku ez di pey de bûm, awayê kurdî bû û folklorê kurdî bû.

*Te got, edebiyata kurdî di bin tesîra edebiyata rûsî û ermenî de bû. Bi raya min ev pîrgirêk li hemû perçeyên Kurdistanê heye. Tevî vê yekê tu rewşa helbesta kurdî çawa dibînî?*

❖ Îro nimûneyên baş gelek in. Li aliyê din problemeke mezin jî heye. Nivîskarên kurd li Kevnesovyetê, hemû



Nivîskar Tosinê R

# Yê nivîskar nikare

berhemên wan bi tîpên kirilî çap bûne û tenê çend ronakbîrên me dikarin wan bixwînin. Heta ji van berhemên bêxerab in.

Gelek tiştên baş hatine nivîsandin. Gelek nivîskarên me yê hêja hebûne. Bi taybetî jî di salên 60'î de. Mirov dikare bibêje piştî salên 60'î bandora wêjeya ermenî û rûsan şikest. Piştî vê yekê hişyariyê mezin çêbû. Li seranserê Sovyetê, piştî rakirina kûlta Stalîn gelan bêhna xwe berdan. Vê yekê, rehetiyê mezin di nava edebiyata hemû gelên di nava sînorên Sovyetê de dijiyan, çêkir.

piştî vê ev tema bi germî kete edebiyata me. Cara pêşî me xwe wekî gelê kurd dît. Heta wê demê jî me xwe wek kurdên Sovyetê dizanî. Tê bîra min, carekê min di gotareke xwe de gotibû, 'gelê me yê Kurdistanê' yekî ji min re gotibû, tu çima wisa dibêji.

Yanî piştî salên 1960'î bi gelemperî xelkê xwe wekî parçeyekî Kurdistanê dît û vê yekê bandoreke mezin li wêjeya me kir.

*Em dîsa li zargotîna kurdên Sovyetê vegevin. Tu dikarî hinekî din jî behsa*

gotinê bûne. Di sala bîst û şeşan de ev kaset hemû hatine nivîsandin. Rûsan gelek kesên ji Sanpetersbûrgê şandine nava ermenîyan û stran berhev kirine. Heçiyê Cindî di sala 1929'an de dest bi berhevkirina zargotinê kiriye û di sala 1936'an li ser folklorê kurdî pirtûkek çap kiriye. Ev pirtûk, heta îro jî wekî pirtûkeke pîroz tê hesibandin. Tê gotin ku Serokê Komara Mahabadê Qazî Mihamed pirtûk daniye ser maseya xwe û gotiye: "Qurana me ev kitêb e!" Bi sedan pirtûkên bi vî rengî hatine çapkirin. Heçiyê Cindî pênc cild hikayetên bi kurdî çap kirine. Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl û gelek kesên din berhemên folklorê kurdî berhev kirine û dane çapê. Nûra Cewherî hîna di 19 saliya xwe de li ser muzîka kurdî pirtûkek çap kiriye. Bi kurtî di wê demê de rûmeta folklorê di nava me de bilind bû û Dewleta Sovyetê jî alîkariya me dikir.

*Ez dixwazim ji zargotinê derbasî helbestê bibim. Dema te dest bi helbestê kir, haya te ji helbest û helbestvanên li Kurdistanê hebû?*

❖ Ez divê bêjim ku bextê min gelekî vekirî bû. Ez hîna 15 salî bûm, Qanadê Kurdo (apê min e) bi xwe helbestên Cegerxwîn li daktîloyê xistibûn û ji bo ku ez di nava du mehan de hemûyan jiber bikim, ji min re hinartibûn. Bi rastî jî min hemû di nava du mehan de jiber kirin. Ji bo ku mirovekî wisa alîkariya min dikir, ez bextvekirî bûm.

Ez di sala 1959'an de çûm Lenîngi-

Ger Ehmedê Xanê bi farisî yan bi erebî nivîsibûya, dê navê wî li cîhanê belav bibûya. Çima Yaşar Kemal tê naskirin lê Apê Mûsa na, dîsa çima Selîm Berekat lê ne Şêrko Bêkes. Dîsa Cegerxwîn çiyayek bû. Lê gelê me di destpêkê de cih neda wî. Heta rûmeta helbest û helbestvanê kurd çênebe, helbest bi pêş nakeve.

Her wiha di nava edebiyata kurdî de jî tesîreke erênî çêkir.

Bêguman tişteki din jî tesîreke baş di wê demê de li edebiyata kurdî kir. Piştî salê 1963'an hukumeta Sovyetê bi awayekî fermî piştgirîya Şoreşa Başûr kir. Digel vê yekê hemû rojname û kovarên Sovyetê li ser kurdan nivîsandin. Di edebîtaya me de temaya neteweyî tunebû, lê

*vê çavkaniya edebiyatê bikî?*

❖ Em rûmeteke bilind didin zargotin û folklorê xwe. Ev rûmet ji kal û bavên me derbasî me bûye. Hemû şahî û dawetên me bi kurdî bûn. Dîsa di dîne me êzîdîyan de hemû dua û qewl bi kurdî ne. Di destpêkê de Dewleta Sovyetê rûmete mezin da folklorê gelan. Mesela di salên bîstan de mala me tîje kasetên zar-



radê nik Qanad. Li wir, min hemû pirtûkên di kitêbxaneyaya wî de bûn, xwendin. Apê Osman Sebrî, Cegerxwîn û hemû şairên mezin yên Kurdistanê min li wir nas kirin. Mameste ez fêrî tîpên erebî jî kirim. Min dest bi xwendina berhemên bi soranî jî kir.

Dema me di sala 1961'î de komeleya kurdan li Ermenîstanê ava kir, min helbestên Cegerxwîn xwendin. Tu kesî navê wî nebihîstibû. Mesela di sala 1963'yan de pirtûka Apê Musa Anter ya bi navê Bîrîna Reş kete destê min, ku li bakurê Kurdistanê jî kêm kesan xwendibû.

*Tiştê ku helbestvan ji nivîskarên pexşanê cuda dike, hinekî jî diltenikiya wî ye. Wekî din çi ferqiyet di nava helbest û pexşanê de heye?*

❖ Ez dibêjim pexşan himê edebiyatê ye. Li her deverê wêje bi helbestvan dest pê dike, piştî cihêkî pexşan gavên mezin diavêje. Di dîroka me kurdan de jî ji Dema Navîn (Ortaçağ) û heta îro jî helbestvanên me yên mezin hebûne. Lê pexşan tenê di sedsala bîstan de hate pê. Klasişkên me hene, wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran. Bêguman ew kevneşopiyên rojhilat in. Li aliyekî din jî edebiyat digihe dereceyekê. Di pexşanê de problemên gel zêde cih digirin. Lê di tradîsyona me de helbest hîn xurtir e. Ferqiya wan zêde ji hev tune. Helbest û pexşan her yekê cihêkî war heye. Pexşan lêhûrbûn û giraniyeke mezin-tir dixwaze.

*Tê gotin ku helbest eyb û şermê ji afrînerê xwe venaşere û hunermendiyêke pir bilind dixwaze. Lê di pexşanê de nivîskar rehetir e. Mefera wî/wê zêdetir e. Tu çi dibêji?*

❖ Ger em tarifeke hîn kintir bikin, helbest ji dil derdikeve, pexşan ji mêjî derdikeve. Helbest, hema ji nişkê ve te digire û tu dinivîsî. Ger tu wê demê ne-nivîsî, paşê tu nema dikarî binivîsî. Di dema tayê de divê tu bidî. Ger te danenî, êdî ew mirar dibe. Lê ji bo pexşanê lêkolîn, fikir, lêhûrbûn û berhevkerin divê. Lazim e tiştê tu dinivîsî baş nas bikî. Tu yê karakteran çêbikî, wan bi cih bikî. Lê di helbestê de ev ne wiha ye. Li aliyê din her diçe sînorên di nav helbest û pexşanê de radibin. Wekî mînak romanên Selîm Berekat bi zimanê helbestê ne. Kurdên ku li Başûrê Biçûk in jî wiha dinivîsin.

*Ez dizanim tu çîrokan jî dinivîsî. Çîrok an helbest?*

Yê nivîskar ne ku dikare binivîse, nikare nenivîse. Tiştê dikeve serê mirov, mîna tayê ye. Heta mirov wî tiştî nenivîse, mirov nikare jê rizgar bibe. Min gerîlayek bi navê Berzan li Başûrê Biçûk dît. Piyên wî di berfê de weşiyabûn. Wekî din jî hemû gelê wir textor, mihendis û karmend, ji bo ku alikariya şoreşê bikin, diçûn palehiyê. Vê tesîreke mezin li ser min hişt. Min nema karîbû nenivîsibûya.

❖ Herdu şax jî li ber dilê min şêrin in. Lê van salên dawî çîrok bêhtir bala min dikişîne. Şerê azadiyê, yê navxweyî û gelek muşkuleyên din hene. Ez dixwazim bi derdên gelê xwe dakevim. Min çend çîrok di van salên dawî de nivîsandine. Dema ez çûm Awustralyayê, min dît ku kurd bi kurdî napeyivin. Min li vir şeş çîrok nivîsin. Ev problemek bû. Ev muşkuleya bi milyonan kurdan bû. Piştî min li ser asimilasyona tirkan nivîsî. Her çiqasî ez ne di navê de bim jî, li Bakur niha Şerê Azadiyê didome. Gelek dê û bav hevkarîya dijmin dikin, lê ciwan tevli gerilayan dibin. Min li ser wê rewşa îroyîn jî nivîsî. Ev rewş mirov tûj dike û mirov jî wê rewşê dinivîse û pêşkêşî gelê xwe dike. Nivîskar di aliyê xwe de bi riya nivîsandinê dixwaze problemê asan bike.

*Li bakurê Kurdistanê gerîla li hemberî çaremîn artêşa mezin a cîhanê şer dike. Di vî şerî jî bo edebiyata malzemeyên baş peyda bûne. Çima heta niha wê berxwedanê di edebiyata me de deng venedaye?*

❖ Bi rastî edebiyat timî şûn de dimîne. Mesela di duyemîn şerê cîhanê de Almanya êrîşî Rûsyayê kir, ew xera kir û zirarek mezin da wê. Lê incax piştî salên pêncî berhemên vî şerî hatin nivîsandin. Hinek kes pêre digihêjin germagerma jî dinivîsin. Mesela Şerê Qarabaxê. Tevî ku gelek nivîskarên mezin yên her dû aliyên hene jî, lê heta niha jî tiştê li ser nehatiye nivîsandin. Divê mesele hinek di serê mirovan de cih bigire, heta ku tu karîbî demên wê yên realî ango rasteqîn bidî. Paşê ne rehet e ku mirov karîbe realîteya wê bide. Yan divê mirov di nav de be, yan jî divê mirov piştî belgeyan bide hev. Niha mirovekî wekî min ku hinekî dûr e nikare binivîse. Yên ku di nav de ne û li dora wê ne, baştir dikarin binivîsin. Ji bo edebiyatê detay lazim in. Edebiyat detay e. Di romana mezin a Tolstoy a bi navê Şer û Aştî de fransîzan çend partizanên rûsan ji bo gulebaran-dinê girtibûn, nivîskar çend pel û niv jî bo xwe xurandina gundiyan veqetandin. Lê dema mirovekî wekî min ku zêde bi detayan nizane binivîse, dê berhema wî sist be.

*Lê şoreşa me bi gelek awayan detayên jiyana şer bi riya serpêhatiyên gerîla, zindaniyan, bi riya rexneyan û xwerexneyan, bi riya roportajan û bi riya raporên arşiv dike û di weşanên xwe de belav dike. Mirov dikare bêje ku di vî warî de jî şoreş derfetên mezin ji nivîskarên kurd re pêşkêş dike...*

❖ Ev pir baş in. Ez teqdir dikim. Dê pêxistinêke pir mezin li ser edebiyata şoreşê bike. Lê divê mirov îro tiştên po-

kurd li gundên wê dijîn. Pênc hezar heb rojnameya Riya Teze di nav me de dihat belavkirin. Tevî ku em ewqasî hindik bûn jî, ewqasî rojname dihatin belavkirin. Lê îro ev kovar û rojnameyên me yên derdikevin çiqasî tene firotan? Mesela nêzîkî çend milyon kurd li Stenbolê dijîn, dema kitêbek li wir derketa diviyabû sedhezâr bifirota. Edebiyat dema xwendevanên wê çêdibin bi pêş dikeve. Dema nivîskar hîs bike ku kesek berhemên wî naxwîne, wê demê destên wî nema pênûsê digirin. Divê rûmeta nivîsandinê di nava gel de çêbibe.

Ger Ehmedê Xanê bi farisî yan bi erebî nivîsibûya, dê navê wî li cîhanê belav bibûya. Çima Yaşar Kemal tê naskirin lê Apê Mûsa na, dîsa çima Selîm Berekat lê ne Şerko Bêkes. Em divê xwendevanên çêbikin. Dîsa Cegerxwîn çiyayek bû. Lê gelê me di destpêkê de cih neda wî. Heta rûmeta helbest û helbestvanê kurd çênebe, helbest bi pêş nakeve.

*Çêbû. Niha çi xebat li ber destê te de hene?*

❖ Ez bi berdeyamî çîrokan dinivîsim. Ez dixwazim ji rûsî hinek tiştên li ser kurdan wergerînim kurdî. Wekî mînak, min berhema Qanadê Kurdo ya "Lêkolîna Zazayan" ji rûsî wergerandiye kurdî. Ev berhem, dê ji bo wan kesên ku dibêjin zazakî ne zaravayê kurdî ye bibe bersivê baş. Dûvre xeyalek min heye. Ez dixwazim jiyana Mensûreyê şair û dîroknas bikim romaneke dîrokî. Wê, di dema ku Kurdistan di navbera osmanî û eceman de hatibû parvekirin de, rewşenbîrî kiriye. Ku wê demê di nava gelên cîran de tu kesek wekî wê tunebû. Wê gelek berhemên heja nivîsîne. Di van salên dawî de kitêbek wê li Silêmaniyê û kitêba wê ya dîrokî bi rûsî hatiye belavkirin. Ew, di helbestek xwe de wiha dibêje: "Em serê xwe yê hêjayî tacan, di bin çar-

zîtiv belav bike. Em divê morala gel ji bîra nekin.

*Şoreşa Bakur bi awayekî saziyane bi pêş dikeve. Gelek kovar, rojname, înstîtûtî û wekî şahberhema şoreşê jî Med-TV heye. Ev tesîreke çawa li edebiyata kurdî dikin?*

❖ Bêguman tesîra van saziyan û bi taybetî jî ya televîzyonê li ser çanda kurdî mezin e. Tu tiştê nikare cihê wê bigire. Di her warê hunerê de program tene amadekirin û belav kirin. Mînak, stranbêjek her roj nikare heman stranê bistrê. Mecbûr e kilamên nû biafirîne. Ev jî pêşketinê bi xwe re tîne. Lê dîsa jî ji bo ku edebiyat bi pêş bikeve, ji saziyan heta partiyên siyasî, ji girseya gel heta bi take kesan, divê guh bidin zimanê xwe. Ez dixwazim mîsalekê ji Ermenîstanê bidim. Di dema xwe de em bist hezar

şefan de vedîşêrin." Ez dixwazim wê dewranê, bi hemû aliyên wê di kesayetiyaya wê de bidim. Ev dê ji bo me bibe ders.

*Tu rola Azadiya Welat çawa dibînî? Tu dixwazî ji xwendevanên wê re çi bibêji?*

❖ Ev heftê û pênc sal in dewleta tirkan zordariyeke mezin li gelê me yê Bakur dike. Deranîna wê rojnameyê berxwedaneke mezin e. Ji bo zimanê kurdî stêrka geş e. Dema ez rojnameyê dixwînim, ez ruhekî kurdî dibînim. Derxistin û xwendina wê rojnameyê berxwedaneke mezin e. Azadiya Welat, parastin û pêşdebirina zimanê kurdî ye. Divê gelê me wê rojnameyê bixwîne û belav bike. Her kes divê li rojnameya xwe xwedî derkeve.

## nenivîse

*Em berê xwe hinekî din jî teng bikin. Mamoste tu helbest û helbestvan çawa tarif dikî?*

❖ Nivîskar û nenivîskar, helbestvan û nehelbestvan ji wê û ji hev cûda dibin. Yê nivîskar ne ku dikare binivîse, nikare nenivîse. Yanî mirovê nivîskar nikare nenivîse. Tiştê dikeve serê mirov, mîna tayê ye. Heta mirov wî tiştî nenivîse, mirov nikare jê rizgar bibe. Tiştêkî wisa ecêb hate serê min jî. Ez dixwazim bêjim. Ez li Başûrê Biçûk li Cizîrê bûm. Li aliyê Qamişlo û Kovanê geriyam. Ez çûme Endewarê. Pozê Endewarê wekî topekê ye. Li jêra wê jî Cizîra Botan heye. Kaniya çîrok û hunera me ye. Çemê Dîje di nava wê re diherike. Ez vegeyîyam malê. Em wê êvarê mêvanê erebekî bûn. Lê ew dîmen ji serê min dernedike-tin. Min got: "Biborin! Ez divê binivîsim. Ez divê çend deqeyan tenê bimînim." Min berhema xwe nivîsî û vegeyîyam. Yanî nivîskar ew e ku taya xwe dinivîse. Tema jixwe li cem mirovan heye. Min gerîlayek bi navê Berzan li wir dît. Piyên wî di berfê de weşiyabûn. Wekî din jî hemû gelên wir textor, mihendis û karmend, ji bo ku alikariya şoreşê bikin, diçûn palehiyê. Vê tesîreke mezin li ser min hişt. Min nema karîbû nenivîsibûya. Ez ne bi wê slogana "Yan kurdistan yan neman" re me. Lê piştî ku min ew tevge- ra xelkê dît, ez di bin tesîra wan de mam. Di helbesta min de di çend deveran de "Yan Kurdistan yan neman" derbas bû. Ev tesîr e.

*Ev çîroka me hemûyan e:*

# Gulistan

**E**zê karibim te têgihînim? Nizanim! Ew xweşikbûna te... Di wî dilê te yî piçûk de, ezê karibim cih bigirim. Ezê karibim çavên te yên ku wan hîn dinya nû dîtine bibînim, nizanim... Ezê karibim bi qîrina te re bibim ramûsan...

Bi tenê navê te yî xweşik û çîroka te ya mişt keser dizanim. Ji bo pariyek nanê ku hûn xistin riyên bêyeban û derfetên vê rêwitiya ku mirin ji te re anî, ez wê dizanim. Ew navê ku te jê girt û ku te nedît, ew welatê xweşik ez dizanim. Ew xweşikiya ku te bi çavê serê xwe nedît û ku tu bêveger çuyî...

Tu du mehî bûyî û du mehî jî mayî Gulistanê...! Tu yê qet mezin nebî û tu yê caran jî hay çola ku mirinê ji te re anî nebî. Cihekî çawa bû? Ji bo çi ev mirina ket qîska te!?

Gulistan, tu ji bajarê Mêrdînê ji navçeya Qoserê yî. Li gorî gotina dapîrka te Cemîle, tu li Xerîbiyê ji dayika xwe bûyî. Yanê, li welatê ku te navê xwe jê girtiye, nehatî dinê. Li cihê ku qet tuyê nebînî, qet jê avê venexwî, te çavê xwe ji rojê re vekirine.

Mixabin te ew hewayê welatê xweşik jî nekişand, kezeba xwe ya biçûk. Tu karî bibêjî: "Çima ez li welatê xwe ji dayik nebûme? Çima li xerîbiyê? Çima cihê ku ezê nebînim ji min re bû goristan. Ji bo van êtigiyan, min çi kir bi vê piçûkiya xwe. Tu dikarî bi dehan pîrsan bipirsî. Tu dikarî ji pîrsekê hezar pîrsî bibarînî. Tu dikarî bibêjî, ji bo çi te ev nivîsar nivîsand? Bersiva ku ez bidim te ev e: Çimkî ez dixwazim herkes te binase û çîroka te hîn bibe. Çimkî ev bi tenê ne çîroka te ye, çîroka me hemûyan e Gulistanê...!

Di sala 1993'an de li welatê te ji bo ku şerekî qirêj (Li te tika dikim nebêje "şer çi ye?") çimkî divê ku zarok qet hînî vê peyvê nebin) heye û gundê we tê hilweşandin. Mixabin dîsa di eynî salê de bavqocikê te tê revandin û nema li tu deran tê dîtin.

Gulistan!

Wekî min got, ez naxwazim tu hînî peyva "şer" bibî. Di vî şerî de bi hezaran kesên din jî wekî bavqocikê te hatin windakirin. Wekî gundê we Yawrê, bi hezaran gund jî hatine şewitandin. Wekî te bi hezaran zarok bêbav, bêdê û bêgund mane. Piştî ku gundê we ji aliyê neyaran ve tê şewitandin, malbata te bar dike diçe Qoserê.

Gulistanê!

Peyvên ku tu wateya wan nizanî ez bikar tînim, li qûsirê nenihêre. "Mêrdîn çi ye?", "Qoser çi ye?" tu dikarî bipirsî. Ku tu bijiya, teyê bi xwe ev dever û hemû xweşikbûna Kurdistanê bi çavên serê xwe bidîtana. Gulistanê bawer



Wêne: Nûbihar

bike! Ez nikarim ji te re delaliya welat şîrove bikim. Çimkî xweşikbûna welêt çavkaniya hezkirin û evîne ye. Divê her kes li vê kaniyê bi tasan tîbûna xwe bişkîne. Bi çeman re biherike, bi kulîlkê zozanan re dîlanê bigire, bi çîyan serbilind bibe û li deştan dil bigerîne.

Dema ku malbata te ji gund derdikeve, li Xerîbiyê diçe ser kar û xebatê. Cihê diçinê, ji bo pariyek nan, tu êtigiyê ku nabînin û nakşînin tune. Gulistan, xerîbî ewqas zor e ku , çi dibêjim têrê nake. Em di demeke wisa de ne ku kurdûyîm sûc e. Lê kurd bi nasnameya xwe, bi rûmet û li hemberî hemû zordestiyan jî xwe diparêzin.

Gulistan, ji bo karê bax û baxçeyan (karê werzî) bi hezaran kurd xwe li riyên dixin. Mîna te bi çendan beybûnên stû xwar hene. Ku ev çiqas çîroka te ye jî, çîroka hemû zarokên wekî te ye Gulistanê...!

Ku malbata te dide ser rîya Xerîbiyê, hîn tu di zikê diya xwe de 34 mehî bûyî. Axx Gulistanê! Ger derfet hebûna qet diya te, bavê te diketin riyên Xerîbiyê. Bi vî şiklî malbata te bi mehan ji welêt dûr dimîne. Hesreta welêt, wekî stêrkekê diçirûse, di dilê malbata te de.

Her ku roj diborin jidayikbûna te jî nêz dibe. Ji xem û kederê konê ku tê li dar xistin, di nava vê hesret û kederê

de, jidayikbûna te, wekî tasek ava ku li çolê bê dayin, kezeba malbata te hênik dibe. Ji ber vê hesretê navê te datînin Gulistan. Dixwazin dema ku gotin Gulistan, bila ji hesreta welêt re, tu bibî dilopek av.

Belê Gulistanê!

Bi vê biçûkbûna te, ji bêgaviyê malbata te ji bo karê matotiyê dide ser rîyan. Di navberê de heft meh derbas dibin û tu jî dibî du mehî. Ez bi hûrbînî bi vê serpêhatiya malbata te nizanim. Ku dapîra te Cemîle dipeyivî, ev êş û azar li ser lêvên şîr barkirî xwe didan xuyakirin. Dapîra te Cemîle di binê barê salan de ewqas ketiye, çi bêjim nizanim. Di her xêzeke rûyê wê de çîrokek veşartî ye. Por lê wekî serê çîyan sipele bûye. Destê wê jî wekî dilê wê cedew girtibûn. Ku tu hembêz dikirî, kî çi zane çiqas kêfa wê jê re dihat.

Gulistanê!

Ewqas êş, keder, êtigi û xem, hemû ji bo rojên pêşandanê. Ji bo xweşikbûna welatê serbixwe ye. Ji bo vê şewlê, bi hezaran xwişk û birayên te xwe feda dikin. Her tiştî ji bo rûmeta jiyana mirovahiyê ye. Ji bo Welat e Gulistan. Ji bo ku zarokên wekî te li welatê xwe karibim bijîn, bilizîn, û şikir bixwin. Li dijî tariyê ev keç û xort di şer de ne Gulistan...!

Ez dirêj dikim Gulistan. Çimkî nex-

wazim bêm dawiyê û te di vê çîrokê de winda bikim. Belê Gulistan tu du mehî mayî. Di berbangiya sibeyekê de, di hembêza diya xwe de, di nava ava Çema Gedîzê de, tu, diya te Asya û du birayên te ve hûn winda bûn Gulistanê! Yanê "Spî çiqas spî ye, reş çiqas reş e" tu nabînî.

Nepirse Gulistan...

Ez pê zanim tuyê çi bipirsî. Belê wan tu birî, di dilê Welat veşartî. Te yê jî ev yek bipirsiya? Ne wisa! Ev çîroka çarenûsa me ye Gulistan. Li dijî vê "çarenûsê" hezar di şer de ne. Heta xelastbûna Welat jî ev şer dê bidome.

Ax...! Gulistan wan xweşikbûna te di tariyê de vemirand. Lê ewê jî di stêrkên çavên te de bifetisîn. Ne ji bo tu tiştî, ji bo xweşikbûna û delaliya zarokan be jî, hewce ye ev welat ji bin destê van xwînmijan bê xilaskirin. Wê were xilaskirin Gulistanê! Tu bawer be belê Gulistan...!

*Li çermê xezalan binivîsin dîroka vê mirinê*

*Bila ji hemû çaxan derbas be bê Bila xeynî tiliyên zane lê negerin çavên ku bi çîrokên nelet dixwînin Bila ji çolê bê agir Li kaniyan bêav bimîne*

- Navenda Çanda Mezopotamîyê ya Stenbolê
- 31.01.99 şemf: Teatra Jiyana Nû "Şermola", saet:15.00 Cih:Navenda Çanda Tevtonia NÇM'ya Îzmîrê
- 30.01.99 şemf: Roja Xwarinên Kurd ên Kevneşopî ya 29. emîn.
- 31.01.99 yekşem: Konsera Jiyana Welat "Şervanê", saet:17.00



- YÇKM
- 30.01.99 şemf: Filmê belgeyî: "Ernesto Che Guevera", saet:19.00
  - 31.01.99 yekşem: Semînera li ser mirov û tenduristiyê-1 "Nexweşiyên teger (bulaşçî) û riyên xwe parastinê". Beşdar: Kenan Yıldız (Laborand), Bülent Akdemir (Memurê tenduristiyê), saet:15.00 Navenda Çanda Tohum
  - 30.01.99 şemf: Panel: Împeryalîzm û qeyran. Beşdar: Temel Demirer (Rojnameger-nivîskar), Musa Servi (sendikavan), saet: 15.00
  - 31.01.99 yekşem: Filmê 'Darizandin', saet:15.00

Azadiya Welat li DGM'ê bû

# 'Bi zimanekî ku dişibe kurdî diaxivin'

Di darizandinê de bikaranîna hevoka 'zimanê kurdî' ji aliyê serdozger ve, balê dikişîne. Ji ber ku di mehkemeya rojnameya Welatê Me de dadger ji bo xweparastina bi kurdî gotibû 'bi zimanekî ku nayê fêmkirin diaxivin'.

**L**i biryarên nehiqûqê yên Dadgeha Ewlekariyê ya Dewletê (DGM) yekê din zêde bû.

DGM'ya ku ji aliyê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ve jî nemeşrûbûna wê hatiye destnîşankirin, roja 26'ê rêbendanê ji bo Berpîrsê Karên Nivîsaran ê Azadiya Welat M. Salih Taşkesen û Xwediyê wê M. Nuri Karakoyun, di danişinê de cezayên giran dan.

DGM'ê, ji ber wêneyê ku di rûpela yekemîn a hejmara 123. a Azadiya Welat de hatibû çapkirin, salek ceza û 3 milyar 50 milyon jî cezayê pere li M. Salih Taşkesen birî. Berpîrsê Karên Nivîsaran ê Azadiya Welat Salih Taşkesen di roja 27'ê sermawezê sala 98'an de hatibû binçavkirin û piştî 4 rojan di binçavan de mabû, hatibû girtin û peyre ji bo Girtîgeha Ümraniyê hatibû şandin. Taşkesen, roja 26'ê rêbendanê 99'an hate tahliyekirin.

DGM'ê li xwediyê saziyê M. Nuri Karakoyun jî 125 milyon cezayê pere birî. Xwediyê Azadiya Welat M. Nuri Karakoyun di dadgehê de xwest ku parastina xwe bi kurdî bike lê daxwaza Karakoyun ji aliyê dadger ve nehate pejirandin. Dadger ji bo nepejirandina xweparastina bi kurdî ev hincet nîşan da: "Bersûc M. Nuri Karakoyun, pirsên me bi zimanekî ku li gorî texmîna me kurdî bû, bersivand. Zimanê fermî tirkî ye."

Di vir de bikaranîna hevoka 'zimanê kurdî' ji aliyê serdozger ve, balê dikişîne. Ji ber ku di mehkemeyên rojnameya Welat û Welatê Me de dadger ji bo xweparastina bi kurdî



M. Salih Taşkesen

gotibû 'bi zimanekî ku nayê fêmkirin diaxivin'. Lê niha dibêje 'bi zimanekî ku dişibe kurdî'.

Di nav van cezayên jorîn de, weşana Azadiya Welat jî ji bo 10 rojan hate rawestandî. Ev ceza, cezeya yekemîn a girtinê ye ji bo rojnameyê. Wekî tê zanîn, belavkirina Azadiya Welat roja 12'ê kewçêra 1998'an ji bo Kurdistanê (Amed, Culemêrg, Şirnex, Sêrt, Dêrsim, Wan ku wekî Herêma Rewşa Awarte tê binavkirin) hatibû qedexekirin û ji wê mêjûyê pê de rojname nakeve van bajarên Kurdistanê.

## Êrîş berdewam dikin

Li aliyê din êrîşên li ser xebatkarên Azadiya Welat jî bêrawestan berdewam dikin. Nûnerê Azadiya Welat ê Îzmîrê Davut Özalp li Îzmîrê hate binçavkirin. Özalp roja 26'ê rêbendanê ligel du rêveberên HADEP'a Îzmîrê Emin Bayar û Abdurrahman Kılıç û Serokê Göç-dera Îzmîrê Turan Boztepe, dema diçe û serlêdana malbateke koçber ku gundê wan hatiye şewitandin û nû koçî Îzmîrê bûye, li Îzmîrê ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin. Derdestkirina nûnerê Azadiya Welat Davut Özalp bi derketina dadgehê ku roja 28'ê rêbendanê pêk hat, qediya.

AZADIYA WELAT

## TÎŞK

Nivîskarê me ji ber gurbûna karê xwe nekarî nivîsa xwe bişîne



BEKİR ŞIVANÎ

Li Îzmîrê Komeleya Koçberan vebû

# "Li dor saziyên xwe kom bibin"

Komeleya Piştgiyaya Çandî û Civakî ya kesên koçberbûyî (GÖÇ-DER) şaxa xwe ya Îzmîrê bi awayekî girseyî vekir. Bo vekirina komeleyê ku roja 23'ê rêbendanê pêk hat, gelek kes beşdar bûn û bo komeleyê piştgiyaya xwe nîşan dan.

Komeleya Göç-Der a Îzmîrê ku demek berê dest bi xebatan kiribû bi şahiyê kokteylî hate vekirin.

Çalakiya vekirina komeleyê ku bi axaftina serokê komeleyê yê bajarê Îzmîrê Duran Boztepe hate vekirin, bi axaftina Serokê Giştî yê Göç-Derê Mahmut Özgür berdewam kir. Özgür di axaftina xwe di li ser sedemên koçberiyê sekinî û got ku dewleta tirk dixwaze bi koçberiyê gelê kurd ji welat, çand û nîrxên civakî dûr bixe û asîmîle bike. Özgür li ser politikayên dewletê ên der barê koçberiyê de jî rawestiya û got ku dewlet dixwaze bi propaganda û birdoziyên sexte gel bixapîne. Wî wiha berdewam kir: "Komîsyona di bin banê TBMM de hatiye çêkirin û projeya Bülent Ecevit a 'Köy-kent' ji bo ku gelê me asîmîle bikin hatine amadekirin." Disa Özgür li ser projeya Vegerîna Gundan (Köye Dönüş) jî rawestiya û got ku ev proje tenê li gundekî ji aliyê gel ve ketiye pratîkê. Wekî tê zanîn ev projeya Ecevit, li gundê Başbağlar ku girêdayî Erzincanê ye pêk hatibû. Şênîyê vî gundi jî bi temamî ji tirkan pêk tê. Özgür ji bo vê yekê got ku armanca wan ew e ku bi vê projeyê gelê kurd asîmîle bikin. Her wiha Muhmut Özgür xwest ku her kes ji herdemê bêhtir li dor saziyan kom bibe û bikeve nava têkoşinê.

Piştî axaftina Mahmut Özgür Serokê HADEP'ê yê bajarê Îzmîrê Ali Yavuz axafinek kir. Yavuz di destpêka axaftina xwe de got: "Em hemû jî kesên koçber in, ji bo vê yekê pirsgireka koçberiyê em jî dikişînin. Îro mirovahî ji nîmetên cihana hemdem sûtê werdigire, lê mixabin em gelê kurd hê jî komeleyên koçberiyê ava dikin." Yavuz di dawiya axaftina xwe de ji bo komeleyê daxwaz û hêviyên xwe yê serkeftinê anîn zimên.

Ji bo vekirina şaxa komeleyê rêvebirên HADEP'ê yê bajar û navçeyên Îzmîrê, nûnerê Özgür Halk, Azadiya welat, Ü. gündem û gelek parêzer û kesên navdar beşdar bûn. Di çalakiyê de ji Navenda Çanda Mezopotamya Koma Çiya, bo beşdaran konserek pêşkêş kir. Program bi dilana mêvanan bi dawî bû.

DAVUT ÖZALP /A.WELAT İZMİR

## Eşqa Derwêşê Evdî û Edûlê

## Evîneke nîvcomayî

Di roka kurdan nehatiye nivîsîn. Ji ber ku timî xwestine zimanî kurdan xilq bikin. Ji ber vê diroka kurdan veşarî maye û tenê di şevbuhêr-kên dirêj de kalan ji nîfşên nû re, dengbêjan ji ji miran re vegotiyê. Nehatiye vekirin ku hatibe vekirin ji negihîştîye bi milyonan kurdan. Lê belê di vê diroka veşarî de efsaneyên mezin ên di paşerojê de, destan, îxanetên mezin û evinên mezin hene. Wekî evîna Derwêşê Evdî û Edûlê ku di salên 1780-1795'an de qewimiye û ji aliyê hindik kesî ve hatiye zain. Derwêşê Evdî tekane lawê mîr e. Şervan e. Leheng e. Di ber evîn û xaka de xwe di kare bimire. Edûl jî qîza mîr e. Devrûyê wê wekî hîvê bedew, saf û paqij e. Li ser bedewbûna Edûlê helbest û pesiname têne rêzkirin. Her kes li pey wê ye. Ji bo ku bedewî û xweşikiya wê bibînin tên ferca wê; ne şev ne roj, bi mehan, ji diyarên dût tînen cem Edûlê.

Lê na!

Edûl wan kesên ku ji diyarên dût tîne ferca wê paş ve vedigerîne. Di wan de evîn û eşqa rastîn nabîne, dilê wê naçe wan. Çimkî ew tenê ji bo bedewiya wê ya fîzîkî tînen...

Temîr Paşa reîsê Eşîreta Mîlan û bavê Edûlê ye. Eşîreteke wî ya mezin û hezeke wî ya bi mezin heye. Nav û dengê wî li welatên dût jî belav bûye. Di nav wî û Eşîreta Kîkan de şer dest pê dike, xwîn dirije.

Lê îxanet li hemberî evînê, li hember rastiyê bi ser dikeve û ji nû ve derdikeve meyanê. Eşîreta Kîkan bi osmaniyan re hevkarîye dike.

Temîr Paşa li dijî hevkarîya Eşîreta Kîkan a bi yekîneyên osmaniyan re bi 80 eşîretên xwe yê li Kurdistanê hemû reîsên eşîretan di bin konê xwe de dicivîne û dibêje kesê ku zora osmaniyan bibê wan bi bin bixê, ezê qîza xwe Edûlê bidim wî.

Di nav van eşîretan de ya ku Derwêşê Evdî reîsê wê bû jî heye. Derwêşê Evdî qerar dide ku li dijî osmaniyan şer bike û diçe cem Temîr Paşa. Lê bavê Derwêşê Evdî naxwaze ku ew here ji ber ku Temîr Paşa berê soza ku dabû wî, bi cih neanîbû, xwişşka xwe nedabû wî.

Derwêşê Evdî dibêje 'na', ji bavê xwe re dibêje ku vê carê bawerîya wî pê tê û dikeve rê.

Reîsên 80 eşîretî di bin çadira Temîr Paşa de rûniştine di bédengiyekê de li gotinên wî guhdariyê dikin.

Lê di nav wan de yek heye ku dilê wî gup û gup lê dixê. Derwêşê Evdî, di dilê xwe de dibêje 'temam ezê pêşî osmaniyan bi bin bixim, dût re jî Edûla bedew ji van diyaran bibim.'

Di vê navberê de Edûl tepsîya qehweyê li ser destê wê tîne hundur û ji reîsan re wiha dibêje: "Kesekî ku dilê wî di min de heye, bila qehweya min vexwe."



Derwêşê Evdî vê fersendê bi kar tîne û qehweyê ji dest digire.

Vexwarina qehweyê ya Derwêşê Evdî, maneya îmkirina peymanê ye bi Temîr Paşa re.

Maneya vexwarina qehweyê ya Derwêşê Evdî, ji bo Edûlê mirin jî dana ber çavan e.

Maneya vexwarina qehweyê ya Derwêşê Evdî mahra bédeng û bê axaftin e.

Şerî li dijî osmaniyan û eşîreta Kîkan dest pê kirîye di bin serokatiya Derwêşê Evdî de. Êdî tîr ji kevanê derketiye. Derwêşê Evdî bi 500 çekdarên xwe ve diçe ser leşkerên osmanî û 1500-1700 leşkerî ji wan dide kuştin. Êdî serkeftin a wî ye. Dema gihîştina evînê hatiye.

Lê wisa nabe.

Bekotî dikeve dewrê.

Li qesra Temîr Paşa, li ser xistina Derwêşê Evdî plan têne gerandin; hin dibêjin "di xew de emê wî bixeniqînin"; hin difikirin ku şerbeta jahre pê bidine vexwarin; hin dibêjin kesekî ku Derwêşê jê nefret dike heye lê li cihyekî dût e. Gava Derwêşê wî kesî bibîne wê bi pey wî bike. Gava Derwêşê Evdî bikeve pey wî, divê ew kes berê xwe bide destê. Gava Derwêşê Evdî ket destê, wê piyê hespa wî têkeve kortalên sixuran, hesp dê bikeve û Derwêşê jî dê ji ser bipengize aliyekî. Di wê navberê de wê leşkerên din êrîşî ser Derwêşê Evdî bikin û wî bidin ber xençeran.

Plan sixurî ye û tê rê.

Derwêşê Evdî le erdê hatiye vezelandin, dev û rûyê wî di nav xwînê de nixumiye. Derwêşê Evdî ketiye xefîkê....Der-

wêşê Evdî hatiye xapandin....Derwêşê Evdî bi xedarî birîndar bûye. Ji bo ku tu kes nebihîse, Derwêşê Evdî vê yekê ji dengbêjan re jî nabêje.

Derwêşê Evdî ji leşkerên xwe re dibêje ku ew naxwaze Edûl di vî halî de wî bibîne. Ji bo vê yekê jî dixwaze cilên pak lê bikin. Leşker daxwazên Derwêşê Evdî tînin cih.

Edûlê Derwêşê Evdî cara dawîn di vê rewşê de dibîne. Lê heya mirinê wî ji bir nake. Wî di dilê xwe de hiltîne. Bi hêviya ku wê rojekê derxîne û bide jiyandin...

Beşek ji kilamên ku dengbêj li ser Edûlê dibêjin:

*Dilê min dîn e, sed carî dîn e*

*Lê dayê bi dest xwe kim*

*Teşîka ji teşîya Bexdatê*

*Herîne ji herîne Mûşê*

*Dakevim binaniya gundê me bilolînim*

*Gelek siwarê ji deşta jêrin vedigerîne*

*Ezê bipirsim*

*tu kesî xeber ji delalê mala bavê min neanîne*

*Min radikir darê dilbîrê*

*Min dinêrî siwarek tê ji xêma binê beriyê*

*deşta me ya jêrin e*

*Xêma binê beriyê dikudîn e*

*Jê re dibêjin Hesên Boz Elî siwarê min-*

*coliyên kap hêşîn e*

*minê xwe berda pêşîya vî siwarî*

*Min digot siwara dilê min dîn e, sed carî*

*dîn e,*

*Dilê min ji kulan bi kul e*

*Ji birînan werganî bi birîn e*

*Dilê min bi xwîn e*

*Kevir lê ketî*

*Derman lê nîn e*

*Birînen min li min zengirîn e*

*Sê roj û sê şev in*

*Edûla Paşayê Mîlan bi hawar û bi qîrîn*

*Erdê dibihîse, ezman hiltîne*

*Sê roj û sê şev in*

*Delalê mala bavê min*

*Xwe berdida xîma binê beriyê*

*Deşta me ya jêrin e*

*Ez nizamim delalê xweş e*

*Ez nizamim delalê bi birîn e*

*Siwar got: Lê bûkê delal pirîn e*

*Li Deşta Bozil Leylanê*

*Delalê dilan e*

*Delal hene di deşt û siwêrekan re revîn*

*Delal hene kap û kulî li şikîn e*

*Delal hene sê roj û sê şevan çek û zirx*

*xwe dananîne*

*Lê bûkê ji min re bêje delalê ku tu dibê*

*çi rengîn e?*

*Edûlê got: Lo siwara*

*Nav û nişanên delalê min belî ne*

*Li yak û pêşîra delêl kirasekî melesîn e*

*Li singê delêl Zêrxê Dawûtî ne*

*De ser Zêrxê Dawûtî de*

*Berdavî ebake esewîn e*

*Berdawî meşleha zelalîn e*

*Bişkovê singê delêl polatmîn e*

*Li nava delêl kembera meqawîn e*

*Şelwarê delêl qelemîn e*

*Sola lingê delêl kiswaxîn e*

*Li serê delêl şalekî ruwês e*

*Orte bi surme çep û çowîrme bi rêşîn e*

*Rêşiyên wê şalê bi destê çil û yek keçikên*

*me Mîlan badayîne*

*Di bin re sinbêlên delêl sor û zerîn e*

*Serê simbêlên delêl bi hena Ûrfaya şevîn*

*zerîn e*

*Hetbanê delêl gergîn e*

*Simsa dîn e, bêt xezalîn e*

*Sinek liken li singê hetmalên delêl bi kulîlê*

*û pisqul bi rêşîn e*

*Çirîka Deşta Sirûşê hûnayîn e*

*Şûr û mertalê delêl zivîn e*

*Berdehên hetbanê delêl Erzerûmî ye.*

*Rûma delêl ûmedî ye*

*Serê Ruma delêl bi guliyên sê Edûlan*

*xemilandî ye*

*Ez nizamim guliyên Fetûma hemûn e*

*Nizamim guliyên Leyla Mala Xidir in*

*Nizamim guliyê min rebenê li serê roma*

*delêl solir û qeîrbaşîn e*

*Siwêr: lê bûkê ew siwarê ku tu dibê*

*Torîne Evdî Şerqî, Derwêşê Evdî ne*

*rakirîye jahra marên qaşa fîncana ser-*

*bixwîn e*

*Li Deşta Bozil Leylanê çavê siwarên*

*tirkan û eraban ji şikîn e*

*Bi deşt û newalên wî siwarî oxaxên pi-*

*kesan vemirîn e*

*Pir keç û bûkan li malên bavê veşerîn e...*

BERHEVKAR: PERWER BENGÎ

# Kovara kurdên Anatoliyê: Bîrnebûn

Hejmara 6'an a kovara Bîrnebûn ku ji hêla kurdên Anatoliya Navîn ve li Swêdê tête weşandin, gihîşt ber destê me. Li gorî agahiyên ku di nasnameya kovarê de hatine nivîsandin, kovar sê mehan carekê ji hêla Weşanxaneyê Apecê ve tête weşandin. Li ser kovarê mêjûya payîza 1998'an hatiye nivîsandin. Kovar bi gelek nivîsên bi kurdî û tirkî hatiye xemilandin.

Tê zanîn ku kurdên Anatoliya Navîn her tim li kurdîtiya xwe xwedî derketine, di rîya şoreşa Kurdistanê de gelek şehîd jî dane. Navê çend kesên bi vî rengî di nava rûpelên kovarê de cih girtiye. Lê yekemîn car e ku wan dest avêtiye xebateke bi vî rengî. Ev yek jî ve kovarê girîngtir dike.

Kovar bi sergotara bi navê "Ji Bîrnebûnê" dest pê dike. Nivîs bi çend rêzên li ser sê şexsiyeten kurd (Kürt Remzî, Orhan Kotan û Sebrî Botanî) ên ku koça xwe ya dawîn kirine, dest pê dike. Dûre li ser naveroka kovarê hinek agahî tene dayîn. Nivîsa navborî jî hêla xwediyê Weşanxaneyê Apecê Alî Çiftçî ve hatiye nivîsandin. Beşeke girîng a kovarê, ji nameyên xwendevanan re hatiye terxankirin. Di nameyan de tevî hinek rexneyên

xwendevanan, pêwîstî û girîngiya kovareke bi vî rengî hatiye zimên.

Di vê hejmarê de hinek nivîsên ku mirov dikare li ser raweste ev in. Di nivîsa bi sernavê "Kırşehir'in başka bir yüzü: Kürtler" de Vahit Duran ji aliyê erdnîgarî, dîrokî û etnografîk ve li ser kurdên vî bajarî agahiyên balkêş dide. Dengbêj Temelî çend stranên herêmî digel ravekirina mijara wan darijîne. Nivîskar û lêkolîner Mehmet Bayrak li gorî belgeyên tirk û osmanîyan aliyekî din ê dîroka kurdan ronî dike. Sernavê nivîsa wî "Devletin Gizli Belgelerine göre Binboğlarda Kürt Aşiretleri" ango li gorî belgeyên dewletê yê veşarî li Binboğayan eşîrên kurdan e. Her wiha Ferîdûn hin aliyên Zerdestî dide ber dab û nêrîten kurdên Anatoliyê. Sernavê nivîsa wî jî "Ateş Kültü" ye. Piştî vê nivîsê hevpeyvîna digel helbestvan Ömer Faruk Hatipoğlu tu tê. Ev hevpeyvîna jî hêla M. Şirin Dağ ve hatiye kirin.

Nivîseke balkêş a ku di vê hejmara kovara Bîrnebûn de cih digire jî, nivîsa Bayram Ayaz e. Ew jî li ser kurdên Kırşehirê serpehatiye xwe vedibêje. Her wiha Mahmûd Lewendî jî ji bo kovarê nivîsek amade kiriye. Nivîsa bi navê "100 Saliya Rojnamegeriya Kur-

dî" li ser 127 rojname û kovarên kurdan ên ku li Swêdê derketine radiweste. Di kovarê de digel van nivîsan Bekir Darî, Simoyê Xerşîd, Fêwaz Husên bi nivîsên xwe yê li ser mijarê cur bi cur ketine nava rûpelên vê hejmara kovarê.

Divê li ser zimanê kovarê jî hinek tişt bînin gotin. Zimanê kovarê kurdî û tirkî ye. Ev yek dibe ku wekî tişteki surîştî bê dîtin, lewre rewşa kurdên Anatoliyê bo kovareke xwerû bi kurdî dest nade. Lê di nivîsên bi kurdî de yekgirtinek nîn e. Her kesî li gorî xwe nivîsandiye. Di tiştên gelêrî de parastina cudatiya devokan tişteki pêwîst e. Lê di nivîsên



din de jî hevgerînek nîn e. Heta di alfabe de jî dubendiyek balê dikişîne. Redaksiyona kovarê destê xwe nedaye nivîsan, lewre jî digel nivîsên bi devoka kurdên Anatoliyê, nivîseke bi devoka Liceyê jî di nava kovarê de cih girtiye.

SEWÎSA ÇANDÊ

## Xemgînî û şahî

HASAN KAYA



Beriye ku ez dest bavêjim pê nûsê û dest bi nivîsandina vê nivîsarê bikim min di dilê xwe de got, "gelo dîsa ezê wekî her car, bêhemdê xwe nivîsareke wekî lahmedcûna Rihayê binivîsînim? Lewra ne di destê xwe de me. Ez çiqasî bixwazim nivîsarên ku coşî, şahî û moralê bixine dilê we xwendevanan binivîsînim jî, hew ez dibînim ku dîsa ez ber bi îsota Rihayê ve çûme.

Hevalekê, rojekê ez bawer im bi niyeta ku pesnê min bide gotibû, "Min duh çîroka te ya ku di Welatê Me de hatibe weşandin, ji diya xwe re xwend. Diya min kulmek hêstir di ber re rijandi." Min hew zanibû şa bibûma an jî xemgîniya xwe nişan bidaya!

Sedemên vê yekê çi ne? Sedemên vê yekê ne yek û dudu ne. Ku bi awayekî zanîni lê bêtê nêrîna dê were dîtin ku neqş û motîfên li ser dilê mirov ên ku xwe bera ser rûyê mirov jî didin, ji mercên cihê ku mirov lê dijî tîn.

Rûyê mirov neynika dilê mirov e. Dil jî avê ji kaniya welatê xwe vedixwe. Ava kaniya welatekî ji nav çiya, deşt, lat û zinaran dadiwêrîve. Reng, bêhn, tam û qelîteya xwe ji maden, hewa, fêkî û axê digirin.

Dema ku ez qala rûyê mirov dikim, her dem rûyê şair Cemal Süreya tê ber çavên min. Hêj di wan salên ku diçûme lîseyê de, min şîrên Cemal Süreya xwendibûn. Di şîrên wî de xemgîniyêke dijwar a wekî tûtina ku demarên wê ji aveke cemidî av vexwaribe bû.

Di hemû sûretên wî yê ku di kovar û rojnameyan de derdiketin de, rûyekî mişt hezn, çavên bi keser û lêveke zîz ne mimkun bû ku bala mirov nekşîne ser xwe.

Helbet dem hat û çû, ez hîn bûm ku Cemal Süreya bi eslê xwe ji kurdên Dêrsimê ye. Di Terteleya Dêrsimê de hêj şeş salî bûye. Ew tevî malbata xwe hatiye sirgûnkirin, ew şandine der û dora Marmarayê, bajarê Bîlecikê. Navê wî yê rast Cemalettîn Seber bûye. Di binê siya singûyên romîyan de, tevî eşîra wî ew avêtine zikê fargona trêne û berê wan dane xerîbiyê. Diya wî jî bavê wî jî li sirgûnê mirine. Piştî ku ez bûme xwediyê van agahiyan êdî min zehmetî nekîşand ji bo ku ew jî hezra li ser rûyê Cemal Süreya têbigihîjim.

Vî camêrî kurdîtiya xwe veşartiye, beriya

ku wefat bike bi demeke kurt li xwe mukir hatiye. Carekê di guhê hevalekî xwe yê ku pir pê bawer bûye de gotiye, "Di jiyana xwe de bi tenê ez ji te re dibêjim. Ez kurd im." Piştî mirina vî şairê ku di nav edebiyata tirkî de cihekî wî yê giran heye, hevalê wî ev sir eşkere kiriye.

Çihana mirov a hundirîn di dema zarokatiyê de tê neqîşandin. Ew tîla bi dirî ya di navbera Bakur û Başûrê Biçûk de, ew tîla ku Nisêbîn û Qamişloyê dixê du şeq di welatê me de psîkolojiya sirgûniyê bi me re çêkir. Ew qaçaqçiyên ku di nav zeviyê mayinkirî de diman û cendekên wan dianîn nexweşxaneyê Nisêbînê, wekî a niha li ber çavên min in. Ji bîr nabin. Ruhiyeta me hinekî li ser rûyê miriyan, li ser tîla bi dirî (dirî) û li ser sirgûniya di welatê xwe de ava bûye.

Va ye nivîsara min bi dawî bû, dîsa min dest nehilat ku nivîsareke ku dilê we hênik bike, binivîsim. Bibexşînin.

Ma ne jixwe em nivîskar û xwendevanên Azadiya Welat komikek in? Em mîna malbatekê ne û bi tewekul in. Dilê me fireh e. Em dikarin li neyarên xwe jî bibihurin ku em zanibin nêzîkbûn ji dilekî safî ye...

# Şertê îslamê çend in?

**M**irovek dimire. Zebanî jê dipirsin: “Şertê îslamê çend in?” Mirov dibêje: “Bîst û pênc in” Gava ku wisa dibêje, zebanî lê didin. Ji ber ku wexta wî ya li cihanê tijî nebûye ji mirinê vedigere, îcar mele jê dipirse, dibêje: “Li wê dinyayê çi hebû?” Mêrik dibêje: “Ji min pîrsa şertê îslamê kirin, gava min got bîst û pênc in. Li min xistin!”

Mele dibêje: “Ehmeq, te bigota pênc heb in.”

Haho! De werin li aqilê mele binêrin,

min got 25 li min dan, heke min bigota pênc dê wan ez bikuştama.

MEMED/MÛŞ

Li wir ker heke gelo?

Pişti şerê çekdarî, li gelek cihan, êvaran gerîla serdest bûn û bi roj jî serdestî dikete destê leşkeran. Minaqeseya her kesî bûbû şer û gerîla. Gerîla gava ji gundekî diçûn gundekî din, berî çûyîne telefon dikirin wî gundî ka leşker hene an na. Ji ber ku li telefonê dihate guhdarkirin gundiyan di telefonê de navê

leşkeran “ker” danîbû.

Rojekê dîsa gerîla dikin ku biçin gundekî. Berî çûyîne mîlîsek telefoni wî gundî dike, jinik tê ser telefonê û zîlam ji jinikê dipirse, dibêje: “Xwişka min gelo ker li derdora we hene an na? Hin kerê me wînda bûne!”

Jinik jî ji ber ku nizane mirov behsa kerê rastîn dike an behsa leşkeran dike, dibêje:

“Wele birayê min heke ku kerên we çar ling bin, ketibûn zewiyê me, me girtin û kirin axur. Lê heke kerê we du ling bin wele êvar e, tarî ye û em jî nizanin!”

Roviyê axayê gund

Roviyekî xapînok raserî gundekî li ser tehtekî (zinarekî) xwe li ser piştê avêtiye erdê, li kêfa xwe mêze dike. Hirçeke ku di riya xwe de diçe, Roviyê xwedirêj kirî dibîne û jê dipirse:

– Birayê Rovî te xêr e. Tu li vir çi dikî?

Rovî sînga xwe dide pêş û bersiv dide:

– Ez axayê vî gundî me!

– Madem tu axayê gundî tu çima naçî nava gund.

– Wele ez ji sa (seg) yan newêrim herim.

BERHEVKAR: FAYSAL STÊRKA


Wax! Wax!

Li gundekî Kurdistanê carekê di naxwêra du heb gundan de şer derdikeve. Wî gundî li hev didin. Dî şer de guleyên li eniya gundiyeke dikeve û ew di cihê dimire. Gundiyên wî diçin ser wî laşê wî binin. Ji wan gundiyan gundiyek li yê mirî dinihêre û wiha dibêje: “Wax wax! Welehî Xwedê çavê wî ser randiye, ku fişek piçekî din bi jêr lêketa, çavê wî çûbû.”

Keleşa bi wêne

Rojekê gerîla diçin gundekî, ma dayikekê. Dayik ji wan dipirse: “Hûn xort in. Hûn çima derketine çiyê?” Gerîla bi awayekî ku dayik ji wan fêhmê ke bersivê didin. Dûre çavê dayikê keleşên wan dikeve û dibîne ku wêneyê Serok li ser keleşa gerîlayekî ye. Jê dibêje: “Lawo hûn derketine çiya tiştê nabe. Lê we çima wêneyê Serok li keleşê xistiye? Gava leşker we bibînin hûnê çi bikin?”

BERHEVKAR: WELAT DÎLANWAN




## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (157) XAÇEPIRSA

Çûyîna Çûyîna	B	E	A	R	O	F	O	B	E	J
Çûyîna Wî	F	E	R	A	S	E	T	R	A	
Çûyîna Wî	W	P	S	A	A	E	M	E	R	
Çûyîna Wî	R	E	A	R	A	R	A	T		
Çûyîna Wî	R	O	N	A	K	V	T	O	W	
Çûyîna Wî	K	V	J	T	R					
Çûyîna Wî	H	I	R	A	N	O				
Çûyîna Wî	T	R	E	N	E	Z				
Çûyîna Wî	A	S	A	L	A	R	A			

### Bersiva Xaçepirsa 155'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 157'an pirtûka 'Sam zal ve oğlu rüstem'e



**Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata 155'an Pirtûka Mahmut Baksi 'Gundikê Dono' qezenç kirin in: Maruf Yılmaz/Êlih, M. Hüseyin Doğan/Êreğli, Esat Roni/ Êlih, Ali İmren/Enqere, M. Ali Ertaş/Mêrdin.

Nakokî	Rojek	Kirdkî'yekî Bajarekî serhedê	Bi kirdkî çiya	Musaît	Dar
Şehidek Wêne	Hejmartin a mirovan		5	Paşdaçeke k	
			2		
Bi soranî bi		Qiz, keç		Bi kirdkî ev (nêr)	7
Sermewzû				Xwedayek	
1					Cinavka pîrsê
Dengdar- rên nîji		Tîpa dî q'yê	3	Fikir Navekî biyanî ye mêran	
A di					
		Bi kirdkî lişt		Li hembere bir	
		Demjîmêr		Bêhna pîs	
Sewaleke berepaşkî		Sembola nazîyan			
Dengdêrek e kurdî		Dengdarê n wad		Ben	
4	Ne asayî	6			
	Xwuşka mezin				
Mirnişînek e kurd					
Dewleteke kevn					
		Kesê pêdi- viya wî/ê bi avê heye		Sembola iyotê	8


PEYVA VEŞARÎ



# Roşnîkar û şoreşê neteweyê bindest

Roşnîkarî mêjg, çim û zerya şaranê. Ê raya rast bi weşin û kerdenanê xoya mûsnenê şarê xo. Bêguman şar ebi roşnîkaranê xoya weşina newî awa kenê. Çi ke roşnîkaran nasnameya herî berz û rûmet dayina kesan û şaran a. Ê kesî jî ebi na nasnameya veng û rûmetê şarê xo dinya de danê silasnayin. Dinya rûmetê jew şarî kesayetîna înan ra genê. Zey roşnîkarê latîni, fransîzî, yewnanî, rûsî, cezayirî, yahudiyan û zeybînan bibê leteyê şoreşî. Roşnîkaranê nê yaran weşin û nêweşina şarê xoya biyê jew. Ê jew roj jî şarê xo ra ciya nêmendê. Ê timûtim biyê estarik û verniya şarê xo de akewtê. Çi ke ê kiştê ra jî şoreşger eyê. Eke jew roşnîkar, şoreşê şarê xo de wexto ke ca nêgiro, kes nêşeno ey rê vajo roşnîkar yan jî estarika şoreşî. Coka jî roşnîkarê neteweyê bindest, nêşenê xo rê vajê: "Ez roşnîkara siyasetkar niya. Bê fikirê xo ez tewrê weşin nêbena". Çi ke mendin û nêmendina netewî werte de wo.

Barê roşnîkaran zaf giran o. Ê jî zey şarê xo veşan û teşan manenê, îşkence vînenê û kewnê zîndan. Welatê xo ra benê sirgûn, ebi serana xerîbin de manenê. Qandê fikir û ramanê xo zaf zahmet vînenê. Xeylê roşnîkarî jî benê şoreşger û kewnê şoreşî miyan.



Dinya de jî, Kurdistan de jî weşina xeylê roşnîkaran wina ravêdo. Che Guwera, F. Miterand, Viktor Jara, Franz Fanon, İbrahim İncedursun, Mehmet Karasungur, Ozan Sefkan, Gurbetelli Ersöz û zewbînan. Kam şeno qandê nê kesayeteyan vajo, ê roşnîkarî nêbî, ê politikvanî bî. Kes nêvano wa roşnîkarî jî şirê koyan, bibê gerîla û lecê reyayinî de zey neferê ca bigiro.

La belê roşnîkarî kam ca de beno wa bibo, çî kar beno wa bibo, gerek goş bidê wîjdanê xo û goreyê vengê ney wîjdanî jî dekewê barî bin. Wexo ke roşnîkar nêkewo barî bin, ebi şarê xo ya nêbeno jew.

Ewro netewa kurdan newe newe bon awa. Kiştê ra eskeriye, kiştê ra aborî, kiştê ra hiqûq, kiştê ra perwerdekerdin, kiştê ra diplomasî, kiştê ra

çand û dîrok û xeylê lazmiyên netewî newdin ra awa benê. Gerek roşnîkarî şew roj nê saziyan de bixeftiyê, hunêre xo nê cayan de biyarê werte. Wext wextê min û to niyo, wextê awakerdina netewê yo. Dîrok înan ra xeftiyayin û awakerdina weşina newî wazeno. La belê çî heyf o ke xeylê roşnîkarî, hewna kêbêre saziyan ver ar nêravêrdê. Wexto ke şar, persê ney keno jî qehriyenê. Heqê roşnîkaran çiniyo, şarî ra biqehriyê. Çimke şar ebi heme çiyê xoya kewto şoreşî miyan û weşina newî ebi kerdenê xoya awa keno. Çimke şarî miyan de fikrê vejya wo werte, o jî heme çî ra reynayina welatî yo. Şar biyo jew gan û jew solix kam ke teberdê ney ganî de û na solix de bîmano, o kes nêşeno xo rê vajo "ez roşnîkar a" Çimke exlaq na ray nêdano ci.

Bewnê roşnîkar o Cezayirîj, merdimmo hêja Franz Fanon qandê roşnîkaran se vano: "Qandê tewrbîyina şoreşê Afrîqay, nûstina jew dêra şoreşker sebniyo, gerek şima şariya piya dekewê şoreş û awa kirê. Wexto ke şima şariya piya şoreş awa kirê, dêri yê xo bi xo bêrê." Merdimmo weşer Franz Fanon, boka bibo roşniya roşnîkarên kurda yê bîroşnî.

ZÜLKÜF KIŞANAK


## Sersaxî



IPEK ULUSOY

Dayika kerdkar a listikvanê Teatra Jiyana Nû Kemal Ulusoy, İpek Ulusoy xanim roja 23'yê rêbendana 1999'an de çû ser dilovaniya xwe. Em ji malbata Ulusoy re û ji hezkiriyên İpek Xanimê re sersaxiyê dixwazin û dibêjin bila rehma Xwedê lê wê be.

**Hunermendên Navenda Çanda Mezopotamyayê**  
**TEATRA JIYANA NÛ**



SÜLEYMAN YILDIRIM (BRÛSK)

Li ber şhadeta te em serê xwe bi hurmet ditewînin.

Li ser navê Malabata wî

**Faik û Keziban, Birayê wî Rıdvan, Salih û Xwişka wî Gönül û Hevalên wî Mihemed, Ahmet, Muhterem û Mustafa**

*Paşve naçin tu caran  
pêşveçûn her divê bo  
wan,  
Naşkênin tu sozan distirên ji bo welat.  
bixne bin pê zorkeran,  
Bidne ber pê şerkeran!  
Xortên ciwan!  
Bigirin cîhan!  
Saxbin bira,  
Saxbin!*

**WELAT**  
ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN  
■ Yönetim Yeri:  
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308  
Beyoğlu/İstanbul

TEL: (0 212)  
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13  
FAX: 251 95 85  
■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
SAMI TAN  
■ Berpirsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN  
■ ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:  
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.  
■ BELAVKIRIN  
BIRYAY Dağıtım  
■ NIVİSGEBEN TÊKİLİYÊ  
(İrtibat büroları)  
■ Amed:  
Tel: 0 (412) 223 34 83  
■ Mersin  
Tel: 0 (324) 233 83 96  
■ İzmir  
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene  
Tel: 0 (322) 351 42 78  
■ (Nünerê Giştî yê Ewropayê)  
Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815  
■ Swîsre:  
İhsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07  
■ Fransa:

M. Ali Doğan  
Tel- 33 614 32 43 55  
■ Belçika  
I. Can  
Tel:32 53 64 12 41  
■ Hollanda:  
S. A. Fewzi  
Tel-Fax: 31 10 48 555 43  
■ Suriye:  
Jana Seyda  
Helin Nûsiv

# Serdest kişandin ser maseyê

Li gorî zanîstê û felsefeya diyalektîk her tişt di hundirê xwe de dijberê xwe dihevine an jî 'pêşveçûn di encama pevçûna dijberan de pêk tê.' Ev yek ji bo şer û aştiyê jî wisa ye. Ger mirovan di domana dîrokê de şer nekira, dê di wateya rastîn a aştiyê jî negihîştana. Hêmana ku wateya rastîn li aştiyê bar dike şer e. Şeran jî di encama dijberiya serdest û bindestan de rû daye.

Wekî tê zanîn di dîrokê de serdestan dema ku dîtiye 'vizîna meşkê şil e' digel şerê çekdarî ji bo ku rastiyê berevajî bikin serî li metodên şerê psikolojîk jî daye. Heta îro bi pêşketina navgînên ragihandinê re li cihanê şerê psikolojîk girîngtir bûye û serdestan mējiyê mirovan kiriye tala bêjîngê. Lê wekî bav û kalan jî gotiye; "Ahê bizna kol ji bizna kel re namîne." Bindest di dawîya dawîn de mafdarbûna xwe bi mirovahiyê heta bi rêncxwir û serdestan didin qebûlîkirin. Şerê ku li Kolombiyayê li hemberî serdestan tê meşandin jî wê rastiyê îspat dike. Li vî wela-tî jî piştî 34 salên dûvedirêj ên ku mirin û kuştin rewa kiribûn, çirûskên aştiyê jî nû ve gur û geş bûn.

Roja 7ê rêbendanê di navbera serok-dewletê Kolombiyayê Andres Pastrana û serokê FARC'ê Manuel Marulanda de li Bajare San Vicente Del Caguanê jî bo destpêkirina pêvajoya çareseriyê lihevhatinek pêk hat. Her wiha Marulanda li bajarê Sen Vicenteyê derkete pêşberî çapemeniyê. Di vî navberê de bi hezaran gerîlayên FARC'ê li der û dora bajêr û li devê rîyan tevdira ewlehiyê girt. FARC'ê bo pêkhatina aştiyê ev merc dane ber dewletê: Jiholêrakirina nijdeyên kontra (Hêzên Berevaniyê yên Yekgirtî yên Ko-

lombiyayê), bêçekkirin û valakirina deverê ku ji 42 hezar kîlometre çargoşeyî pêk tê, lihevguhêrandina girtiyan, reforma axê, wekheviya aborî û hwd.

## Tilyakfiroş û Şirketên Navneteweyî serdest in

Kolombiya di warê nîrxên binerd de welatekî zengîn e. Xwedî kanên binerd ên wekî; zêr, neft, rijî û nîkel e. Di warê hinardekirina mûz û kulîkan de yek ji welatên sereke ye. Lê li Kolombiyayê çîna birjûwa ya ku bi her awayî girêdayî Amerîka û şirketên navneteweyî ye, serdest e. Kanên sererd û binerd ên welatê navborî bi sedan sal e ji aliyê serdestên Kolombiyayê ve tene firotin; Amerîka û şirketên navneteweyî tê de lotikan diavêjin

Hikûmeta Kolombiyayê bi salan e bi piştigiriya Amerîkayê di serî de komûnîst hemû tevgerên civakî çewisandin. Ji vî zordariyê sendîka, rêxistinên civakî, sivil jî bêpar neman. Piştî ku Serokê Partiya Lîberal di encama sūkastekê de hate kuştin, gel serî hilda. Hikûmetê di navbera salên 1948-1953'yan de 300 hezar mirov kuşt. Di sala 1953'yan de piştî destkariyê leşkerî komûnîstan dest ji çekên xwe vekişand. Lê ji ber ku pest û pêk-tiyên dewletê bêwestan û rawestan domiyan şer ji nû ve dest pê kir. Bi rapêrîna gundiyan re tevgera gerîla rengêkî çînî girt. Varsîl û gundiyan di sala 1957'an de li dijî çîna serdest grevek li dar xist. Her wiha tîn û tirêjên şoreşa Kubayê ya ku di sala 1959'an de pêk hat, wekî tevaya gelên başûrê Amerîkayê gelê Kolombiyayê jî rapêçand



Li Kolombiyayê piştî ku Serokê Partiya Lîberal di encama sūkastekê de hate kuştin, gel serî hilda. Hikûmetê di navbera salên 1948-53'yan de 300 hezar mirov kuştin. Di sala 1953'yan de piştî destkariyê leşkerî komûnîstan dest ji çekên xwe vekişand. Lê ji ber ku çewsandinên dewletê bêrawestan domiyan, şer ji nû ve dest pê kir.

Li Kolombiyayê çîna navîn bi gelek bir û baweriyên xwe ji birjuwaziya mezin vediqete. Her wiha tevgerên gel ên mezin di nava liv û lebatê de ne. Çîna karkeran a ji bo berjewendiyên xwe li dijî DYA'yê û şirketên navneteweyî radibe, sendîkayên li dijî arizîkirinê, gundiyan ku li dijî kesên xwedî erdên fireh têdikoşin, karîger û aktîf in.

Li aliyê din bazirganiya tilyakê wekî sektoreke karîger kar û barên tilyakfiroşiyê didomîne. Sektora navborî niqutiye nava pergala siyasî; di meclîsê de endamên wê hene. Hinek ji wan ji ber vî karî hatine girtin. Li aliyê din rêxistina kontrayî ya bi navê Hêzên Berevaniyê yên Yekgirtî (AUC) ku be destê dewletê ve hatiye sazîkirin, hemû kes û hêzên mûxalîf ji holê radike.

## Kurte dîroka FARC'ê

Hêzên Şoreşger ên Çekdar ên Kolombiyayê (FARC) di sala 1948'an de hate damezirandin. Rêxistinê di 1982'yan de Artêşa Gel (EP) saz kir. Ev artêş, gelek çalakiyan li dar dixê. Ji sedî 40'ê herêma çolter di destê wê de ye û xwedî 15 hezar gerîlayan e. Niha di destê FARC'ê de 245 leşkerên Artêşa Kolombiyayê hene û 252 gerîlayên wê jî di girtîgehên de ne. Di navbera FARC'ê û hikûmetê de bo lihevhatinê di salên 1982-92'yan de gelek hevdiyan pêk hatin. Lê ji hevdiyan navborî encameke erênî demeket. Her wiha

di sala 1984'an de bi hikûmetê re li ser bîngeha jinûve sazîkirina welêt bi navê Yekîtiya Welatparêz (YW) peymanek girêda. Lê digel van rûdanan jî, dewletê bi hezaran endamên YW'ê kuştin.

## Xweseriyên wê

FARC rêxistineke Marksîs-Lenînîst e. Lê her dem bûye xwedî xetere serbixwe û xwe nespertiye tu hêzê. Bîrdoza ML li xweserî û cihêrengiya gelê Kolombiyayê aniye. Nûnerê Karên Derve yê FARC'ê Juan Antonio Rojas li ser vî taybetmendiyê wê wiha dibêje: "Me her dem bi Kevne-Sovyetê û welatên sosyalîst ên din re têkiliyên dostane danîn. Em Marksîzmê bo xwe wekî rêber dibînin û li rastî û mercên welatê xwe tînin."

FARC xebat û çalakiyên xwe bi giranî li çolterên welêt didomîne. Lê bo bidestxistina desthilatdariyê li bajaran jî di nava tevgerê de ye. Li bajaran jî bi çîn û kate-goriyên wekî; xwendekar, karker û ro-nakbîr re pêwendiyên wê hene. Rojas stratejiya FARC'ê ya piştî bidestxistina desthilatdariyê jî bi vî rengî berbiçav dike: "Emê pêşiyê kom û girseyên cuda yên civakê li hev bînin û di nava hikûmeta li hev kirin û avakariya neteweyî (Ulusal in-şaa ve uzlaşma hükümeti) de cih bigrin û têkoşîna sosyalîzmê bidin. Lê eger serdest astengan derxin pêşiya me emê jî bo doza xwe şer bidomînin."



Piştî hevdiyanên bi hikûmetê re Serokê FARC'ê Manuel Marulanda li bajarê San Vicenteyê derkete pêşberî çapemeniyê. Di vî navberê de bi hezaran gerîlayan li der û dora bajêr û li devê rîyan tevdira ewlehiyê girtin. FARC'ê bo pêkhatina aştiyê û lihevhatinê mercên xwe diyar kirin.